

ARMANC  
Ji mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 83  
Tebax  
1988  
Buha: 10 Skr.  
2.5 DM

# Armanc

SERXWEBÚN DEMOKRASÍ SOSYALİZM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magezine  
No: 83  
August  
1988  
Price: 10 Skr.  
2.5 DM

Piştî agirbirrîna şerê Îran û Iraqê

## Pêşmerge bi mîrxasî axa xwe diparêze

■ Piştî rawestandina Şerê Îran û Iraqê, Iraqê bi leşkerekî giran, bi balafir û tanqan ve êrişek mezin bir ser herêma Behdinan.

■ Pêşmerge bi mîrxasî li ber xwe dide, bi hezaran leşkerên dijmin ha-

tin kuştin. Pêşmerge êrişâ dijmin da sekinandin.

■ Mesûd Barzanî: "Şoreşa gelê me berî şer jî hebû û wê piştî şer jî berdewam be..."



Piştî rawestandin û agirbirrîna Şerê Îran û Iraqê, rejhîma xwînmij bi 32 hezar leşkerî û li dor 8 hezar caşî, bi tanq û balafiran êrişek giran bir ser herêma Behdinan.

Li dorhêla Kela Kumrî, Hacî Umran, Darasor, Deştaberazgir, Sîdekan, Gîno, Başvan, Kanîmasî û gelek deveren din şerekî giran dom dike.

Hêzên pêşmerge di vî şerî de zerarîn mezin gihadîn dijmin. Bi hezaran leşkerên dijmin hatin kuştin û birîndarkirin. Li gelek deveran êrişen dijmin hatin şikestin.

Bes di 12 û 13'ê mehê de di êrişâ leşkerên Iraqê ya herêma Lolan de 500 leşkerên dijmin hat kuştin, bi sedan birîndar bûn, helikopterek hat xistin, 54 serbaz hatin dîlgirtin. Di vî şerî de 60 pêşmerge şehîd ketin.

Li ser agirbirrîna şerê Îran û Iraqê, Mesûd Barzanî beyanek da. Di beyana xwe da Mesûd Barzanî weha dibê: "Şoreşa gelê me, şoreşa ber-girtinêye jî mana netewî û ji bo mafênetewî yên rewa ye. Yanjî ji vî şerî çenebûye, berî şer jî hebû û wê piştî şer jî berdewam be."

Pêşmerge bi qerardarî û mîrxasiya xwe li hember dijmin li ber xwe dide û bi vê şela xwe gotinên Mesûd Barzanî dîpejîfîne.

Amîrhêzekî pêşmergan Hemît Ebûbekir di rojnameyek Tirkî de weha dibê; "Hêzên Iraqê yên hewayî bi roj bomban bi ser me de di-barînin û em jî bi şev êrişî şer jî berdewam be."

Dûmahîk r.11

Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER)

## Roj roja xurtkirina piştgirî û têkoşînê ye!

Di meha Tebaxê de Tevgera Rizgariya Kurdistan li ser rawestandina şerê Îran û Iraqê û li ser êrişâ rejima xwînmij a Seddam li Kurdistanê, belavokek belav kir.

Belavok cî dide van rastian:

"Di dawiyê de, piştî şerê gurr ê 8 salan Îran û Iraq ji bo rawestandina herbê, razîbûn ku li masa aştiyê rûnên. Ji bo her du aliyan jî bi fermî agirbirrînê, 20'ê Tebaxê dest pê kir. Roja 25'ê Tebaxê li Cenêvrê di bin çavdêriya Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Milletan civîna lihevhatinê ya Îran û Iraq dest pê kir. Helbet ev pêşveçûnek pozitîv e.

Lê çi feyde, rewşa gelê Kurd nakeve rojeva vê lihevhatinê, temsîldarên wê yên meşrû nakevin van civînan. Bi hin aliyêne xwe ve gelê me pêrgî Lozanek nuh tê.

Lê ragayıştî bas dizane ev herba wêran a 8 salan, ku piranî li Kurdistanê derbas bû û gelê me ji ber vê yekê zayiatên giran da, êş û cefayên mezin kişand. Di vê demê de bi hezaran insanên me jiyana xwe wunda kîrin, bi sedan gund û qesebên Kurdistanê di vê demê de hat şewtandin û wêrankirin.

Ji aliyê din berî ku bihevkevin him Îran

Dûmahîk r.2

Gelê Kurdistanâ Iraqê  
rojên dijwar dijî

Gelê Kurdistanâ Iraqê piştî têkçûna 1975'an û vir de rojên xwe yên herî dijwar dijî. Van du-sê salên dawî rejima Seddam bi hezaran kes ji Kurdistanê surgûnî çolên Başûrê Iraqê kir; bi hezaran kes ji gund û malen wan derxist, di kampan de civand û bi hezaran jî bi çekên kimyayî û bi qetliamên hov qetil kir. Nuha jî bi leşkerekî giran, bi bala-fir, bi tanq û bomben kimyayî êrişî Kurdistanê, erden azadkirî dike. Bi hezaran kesen sivil ji ber vê wehsetê reviyan Tirkiyê û Îranê.

Piştî Peymana Cezayirê ku di sala 1975'a de di navbera Îran û Iraqê de pêk hat, tevgera Kurd têkçû. Her têkçûnek fatûrek gelek buha û giran bi xwe re tîne. Di sala 1975'a de, bi sed hezaran Kurd hatin surgûnkerin. Bi deh hezaran Kurd ji ber zulm û qetliama Seddam bi çol û çepelan ketin; hinek ji wan li Kurdistanâ Îranê di kampan de bi cih bûn, jiyanek tal û dijwar jiyan û hinek jî ji wan bi dizî li Kurdistanâ Tirkiyê xwe vesartîn.


Wisa xuya ye tarîx wê vê bûyerê dubare bike. Herçiqas zulm û zordariya Seddam tu demê li Kurdistanê kêm nebûbe jî, lê di van du-sê salên dawîyê de li Kurdistanê jiyan kir jarî; surgûn, idam, qetliam ji her demê bêtir bi kar anî, taxên bajaran, gundan bi temamî surgûn kirin. Çekên kimyayî ku bi peymanen navnetewî hatine qedexekirin, ev sê sal e ku li Kurdistanê bê paxav tê bikaranîn. Gelê Kurd digel van kirinê dijminê xedâr bi mîrxasî li ber xwe dide.

Kirinê dijmin û berxwedana gelê Kurd nuha ketiye qonaxek nuh û gelek xeter. Piştî agirbirrîn û nêzikayiya Îran û Iraqê, Iraqê bi leşkerekî gelek giran, balafir û tanqa ve êriş bir ser Kurdistanê. Ev meheke ku şerekî giran li Kurdistanê dom dike. Li gor nûçeyen ji herêmê têr, piştî agirbirrînê, Îranê jî deriya xwe li Kurdan girt. Iraq di vê êrişâ giran de çekên kimyayî jî bi kar tîne. Bi hezaran xelkên sivil bi eşyayen xwe yê sivik berê xwe dan Îran û Tirkiyê.

Li gor nûçeyen rojname û ajansên cihanê gelek Kurd derbasî herêma Şemdinan bûn û ji Tirkiyê daxwaza îlîcîa siyasî kirin. Dewleta Tirkiyê bes rojekê müsaade da wan ku li wê derê bimîn, dotira rojê berê wan dan Iraqê an jî Îranê. Sekreterê Giştî yê PDK-I Mesûd Barzanî bang li

Dûmahîk r.11

## Cûntayê xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Güneşi avêt hefsê



Di 18'ê Tebaxê de Mahkema Stenbolê di celsa yekem de 3, 5 ceza da xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Güneşi (Roja Medya) Cemal Özçelik û ew avêt hefsê. Savciyê mehkemê sebebê cezakirin weha eşkere kir. "Kovara Medya Güneşi di hejmara xwe ya sisîyan de şîra Abdullah Pêşew bi navê 'Zafer (Serkeftin)' çapkîriye û di wê şîrî de cumla 'Min ji axê topek da destê zarokekî Kurd, wî şûna bebe-kê ji viya tivingek çêkir' sûç teşkil dike". Sebebekî din jî, cardin helbestek li ser Leyla Qasim e (Hejmar 2).

Helbet 3, 5 ceza yekem de 3, 5 ceza da xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Güneşi di hejmara xwe ya sisîyan de şîra Abdullah Pêşew bi navê 'Zafer (Serkeftin)' çapkîriye û di wê şîrî de cumla 'Min ji axê topek da destê zarokekî Kurd, wî şûna bebe-kê ji viya tivingek çêkir' sûç teşkil dike". Sebebekî din jî, cardin helbestek li ser Leyla Qasim e (Hejmar 2).

Helbet 3, 5 ceza yekem de 3, 5 ceza da xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Güneşi di hejmara xwe ya sisîyan de şîra Abdullah Pêşew bi navê 'Zafer (Serkeftin)' çapkîriye û di wê şîrî de cumla 'Min ji axê topek da destê zarokekî Kurd, wî şûna bebe-kê ji viya tivingek çêkir' sûç teşkil dike". Sebebekî din jî, cardin helbestek li ser Leyla Qasim e (Hejmar 2).

Dûmahîk r.11

İfada M. Şêxmûs Cibran

"HEGER EZ CAREK DIN BIHATIMA DINYAYÊ  
EZÊ DÎSA BIBÜMA ŞOREŞGER"

7

## "Bijî têkoşîna gelê Kurdistan a rizgarbûna netewî û civakî!"

Sistema sosyalist qeweta tayinkir ê vê merhelê ye, YKSS ji merkeza şoreşa cîhanê ye. Di navbera sîstema sosyalist û kapitalist-emperyalist de ku DAY serkêsiya wê dike di warê aborî, siyasi, ideolojîk, ilmî, teknikî û di her qada jiyanê de têkoşin tê meşandin. Li hemberê emperyalizma ku her roj paş de dihere û her roj nêzî mirinê dibe merhela şoreşa cîhanê, hêzên demokrasi û aştiyê ew têkoşîna ku ji bo serxwebûna netewî, aşîfi, demokrasî û sosyalîzmê didin her ku diçe xurttir dibe. PPKK mudafakirekî enternasyonalîzmê yê bi querardar e, bi xurtî piştgirê sîstema sosyalist û tevgera çîna karkir li welatên kapitalist û şerîn tevgerên netewî ye.

### Demokrasiya siyasi:

PPKK li Kurdistanê wê dawî bide serdestiya siyasi ya emperyalizmê, burjuwaziyê kolonialistê monopolist û hevalbendên wan ên mehellî û di pêşengiyâ çîna karkir de, li ser bingehê tifaqa çîna karkir û gundiyan de, hukmekî demokratik a gel ku di nav de hemû hêzên netewî û demokratik

**Di dawiyê de dixwazim  
viya bibêjim; ji ber  
têkoşîna min a şoreşgerî  
ku heta îro min daye û ji  
ber van nivîsandinê min,  
cezayê ku hûnê bidin  
çiqas dibe bila bibe ji bo  
min qet qîmet tuneye. Ji  
ber ku ev, netîcerek sene-  
tê min ê şoreşgerî ye.**

jî cî bigrin wê ava bike. Bi karanîna selahiyeta cumhûriyetê û qanûnî wê Meclisa Netewî ya Kurdistanê pêk bîne. Ji bo karibe serxwebûna Kurdistanê û qezencen şoreş ji êrisen hundir û der biparêze, li gel ordiya gel wê hêzên milisên gel jî ava bike. Ji gel re mafê meşê, azadiya fikrî, maşen pres, weşan û civîna wê bête naskirin. Di iktîdara (hukmî) gel de wê hemû kesen idarevan ji alî gel ve bêtin hilbijartîn û wê hemû qewetên (birîmîn) qanûnî. İcraati û hukmî (yasama, yurutme, yargî) tabî kontrola iktîdara gel be. Seyehat, gerr, têkili û dan û stendin û mafê destnedana xaniya wê di bin teminatê de bête girtin.

### Millîkirin:

Iktîdara Demokratik a Gel; hebûnê ser erd û bin erd, çiftligîn dewletê, çavkaniyê enerjiyê, sigortayan, riyen hesin, muesesên komunikationê, ticaretî der, ticaretî mezin a hundir, tesîsîn mezin ên turistîk, istasyonê radyo û telewizyonê ku di bin mukîyeta emperyalizmê, hêzên kolonialist û hevalbendên wan ên mahellî de ne wê bike malê dewletê û civakê. Vana wê ji bo xiz-

meta gel, civakê bênen xebitandin û ji bona pêşveçûna aboriya welêt wê sermiyanê derive û lazim bi hawakî rîk û pêk têke bin kontrolê.

### Parastin û pêşvebirina ekonomiya millî:

İktîdara Demokratik a Gel ew sanayiya millî ku di pêşketina welat de aletekî esası ye, bi taybetî ji sanayiya giran, wê pêş de bibe û pêşengiyê bide sektora dewletê. Dewlemendiya welêt wê ji bo pêşveçûna gel ya aborî û civakî bê bi karanîn. û ji bo zêdekirina kedê wê hemû tedbir bêne girtin. Bilindkirina sewiya refaha gel wê esas bête girtin û ji bo hilberfîna maddeyên esasî wê ehemiyetek mezin bête dayin.

### Mafê demokratik û civakî ên karkir û kedkaran:

PPKK wê mafê sendîka avakirinê û li-hevkirina kolektif û mafê grewê ji hemû kesen xebatkar re nas bike. Ji bo ku sendîka tevî idare û kontrola karxanan bibe wê hewl bête dayin ku karkir jî besdar bin. Lokawt wê rabe, di jiyanâ kar de wê prensibî rojê 8 seet xebat bête meşandin. Bes di karê giran de ji bo kesen ku ji alî sihetê ve xebata wan ne dirist e, li gor şertan wê wexta wan a xebatê hîn jî kintir bête kiran.

Ji xebitandina zarokan re wê ji binde musaade neyê kiran. Bêni ku ferqiyeta peya û pîrekê bête kiran prensibî ji karê wek hev re heqê(destmiza) wek hev, wê bête bi cîkirin. Mafê teqawitiyê wê ji hemû kedkaran re bête naskirin. Xizmeten sihetê(nexweşxane û h.w.d) wê têkeve bin destê dewletê, problemen kesan û sihetê wê bê pere bête helkirin û bêne têkevin bin teminatê. Problema xaniya ya karkir û kedkaran wê bête helkirin. Ji bo ku bê karî ji ortê rabe wê hemû tedbir bêne girtin.

### Şoreşa Axê:

PPKK wê mulkiyeta erdê(ax) pirr ji ortê rake û erd li gundiyan erdên wan hindik û bê erd belav ke. Wê têkili malê gundiyan dewlemend ên ku bi şoreşê re ne nebe û ji gundiyan ortê re alîkariya dewletê bi her awayî bête kiran. Çiftligîn hilberfînê, erdên xezînê û yên weqfan wê wek kooperatifên zireetê bêne guherandin. Kombûna gundiyan di nav kooperatifan de wê bê teşwîq kiran û aleten ziraî yên kesen xwedî erdê pirr wê ji dest wan bête girtin.

Tesîra têkilîyên feodalî wê bête şikanîn. Deynê gundiyan bê erd û ên erdên wan hindik ji banqe û faîzdaran re, wê bête ip-talkirin. Şoreşa axê(erdi) di bin kontrola hukmî demokratik a gel de di riya komîten ji karkir û gundiyan pêk bêne wê bête meşandin.

### Şoreşa ziman û kultur.

Li Kurdistanê zimanê resmî wê Kurdi be. Sistema perwerdekirinê (maarif) wê teslimî dewletê bibe. Hemû merheleyen perwerdekirinê wê belaş be û wasite û alet jî wê bê pere bêne temin kiran. Ji bo

pêşdeçûna kultur û sinet, wê imkanen herî mezin bêne hazirkirin. Dîrok, edebiyat û kultura gelê Kurd bi naverokek pêşverû wê bête pêşdexistin.

### Cuwani:

Hukmî Demokratik a Gel cuwanan(xortan) iştîq-bala gelê Kurdistanê dihesibîne. Bi hereketa ji vê nuxtê, wê ciwanan ji bin tesîra kultura kolonyalîst û kevnerest xelas bike. Wê ciwanan bi hawakî ku ji gel re xizmetê bibin perwerde bike. Problema ciwanan a perwerdi û kar, wê bê girtin bin teminatê. Xwendin wê ji imû-yaziyê bête derxistin, qabilyeten ciwanen

**Hetta, xwediyê şansê  
careke din hatina dinyayê  
bûma, ji bo ku li hember  
gelê xwe û mirovatiyê  
mesûliyeta xwe bînim cî,  
bi dil û can cardin jî minê  
ev senetê xwe yê  
şoreşgerî hilbijarta.**

karkir û kedkar ên meslekî û zanyarî(pispor) wê bête bi pêşdexistin.

### Eqaliyeten Kurdistanê:

Hukmî Demokratik a Gel bi baweriya mafê wekhevî, wê mafê hemû eqaliyetan (hindikayînetewî) li Kurdistanê dijin, nas bike, di navbêna gelan de wekhevîyê û hevkariya li hember hev di praktikê de bi cîbîne û biçükdiyên û kêmđitina eqaliyetan wê ji ortê bête rakirin. Ji bo pêşdebirina ziman, kultur sinet û edebiyata eqaliyetan hemû imkan wê bête bi karanîn.

### Siyaseta derva:

Hukmî Demokratik a Gel têkoşîna birûmet ku gelên cîhanê ji bo aşîfi, serxwebûn, demokrasî û sosyalîzmê li dijî emperyalizmê, faşîzmê, sîyonîzmê, ne wekheviya irqî û hemû kiranê kolonyalîst didin, bi xurtî jî re piştgiriyê dike. Hukmî Demokratik a Gel, wê dest deyne ser usen(ba-

zen) DAY û NATO yê. Hurmeta ji yekîti û hukumraniya welêt, siyasetek ne êrîşkar û li ser prensibîne ne mudexalekirina meselîn hundirê welatan, siyaseta di nav aştiyê de jiyanâ li kîleka hev dimeşîne û birêvebirina siyasetek serbixwe diyar dike.

Di dawiyê de dixwazim viya bibêjim; ji ber têkoşîna min a şoreşgerî ku heta îro min daye û ji ber van nivîsandinê min, cezayê ku hûnê bidin çîqa dibe bila bibe ji bo min qet qîmet tuneye. ji ber ku ev, netîcerek senetê min ê şoreşgerî ye.

Li vir heger ji bo min yek tiştekî muhîm hebe, ew jî; li hember gelê xwe, welatê xwe û mirovatiyê, bi hindikayî be ji min mesûliyeta xwe bi cî anîye. Ew jî kîfxweşîyeke mezin dide min. Hetta, xwediyê şansê careke din hatina dinyayê bûma, ji bo ku li hember gelê xwe û mirovatiyê mesûliyeta xwe bînim cî, bi dil û can cardin jî minê ev senetê xwe yê şoreşgerî hilbijarta. Ü cardin min bizanîba, ku ezê heta dawîya jiyanâ xwe di zindanan de bîmînim û ya jî ji ber vê têkoşînê ezê werim kuştin, minê dîsa jî ev tercîha bikira. Bes tişte ku min xemgîn dike ew jî ev e: Îro ji têkoşîna xwe ya aktîv dûr mame...

-Bijî têkoşîna gelê Kurdistan a rizgarbûna netewî û civakî!

-Bijî biratiya gelê Kurdistan bi gelê Tirkîyê, İran, Iraq û Sûriyê re!

-Bijî Marksîzm-Lenînîzm û berhemâ wê sosyalîzm!

-Bijî PPKK

-Bimre kolonyalîzm!


-Bimre faşîzm û bingeha wê ya îro emperyalizm!

Mehmet Cibran  
Îmza

## Roj roja xurtkirina...

û him jî Iraq li perçen Kurdistanê yê ku di destê wan de bû, li dijî gelê me herbek neheq dimeşandin. Politika wan a mêtîngîkar ku bi zor û zulmê dimeşînin îro jî her bi wî rengî dom dike. Her du dewlet jî mafê meşru yên gelê Kurd nasnakin... Ji ber vê yekê, eger ew, di navbera hev de li hev bêne û herbê rawestînin jî, ji bo gelê Kurd aşîfi çê nebe.

Bil'eks, ewê, li dijî gelê me îmkana ku quwetên mezintir karîbin seferber bikin, bi dest xin. Çawa hevdûdîtinin "aştiyê" hat



Adres : Armanc  
P.R S-172 06 Sundbyberg  
Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC

Telefax: ATTN ARMANC 46-8-208006

Ansvarigutgivare:

Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen

Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0348 7385

# Panelê li ser rewşa Kurdan

■ Partî û rêxistinê Kurd ji her çar perçen Kurdistanê bi hin şexsiyetên Swêdî re, rawestandina şerê Iran û Iraqê wê tesîrek çawa li tevgera Kurd bike, di panelekê de munaqeşe kirin.

Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê, di 25'ê Tebaxê de li Stockholmê piştî agirbirrîna şerê Iran û Iraqê rewşa Kurdan a iro, bi hin partî û şexsiyetên Kurd û Swêdî re di panelekê de munaqeşe kir. Berî ku panel dest pê bike serokê Federasyonê Koya Îzol bi ahaftinekê panel vekir. K. Îzol di ahaftina xwe de bi kurtayî li ser têkoşîn û rewşa Kurden li Kurdistanâ Iran û Iraqê ya iro sekinî û got ku; "Hewcedariya Kurdan ji alikariya navnetewî re, iro ji her demê bêtir heye. Û di vî warî de Swêd dikare mesela Kurd bibe Koma Milletan..."

Di panelê de ji Kurdistanâ

Iranê PDK-Îran û Komela, ji Kurdistanâ Tirkîyê TEVGER, ji Kurdistanâ Sûriyê, Hevkariya Kurden Sûriyê û Umer Şêxmûs; ji Swêdiyan; Oswald Söderqvist(parlementer), Hans Göran Frank (abûqat-parlementer), Elîn Clason (rojnamevan), Alar Kutman(Di Daîra Muacira de dixeble, Kurdnas), Stefan Hjérten(rojnamevan), Tomas Rotheserfser(abûqat) besdar bûn û bi dûr û dirêjayî rewşa iro ya Kurden û Iraqê munaqeşe kirin.

Di panelê de li ser 8 pirsan hat munaqeşekirin. Van pirsana bi kurtayî: rawestandina şerê Iran û Iraqê dikare tesîrek çawa li tevgera Kurden

■ Li Rojhilata Navîn heta ku mafê Kurden neyê dayîn, bicib ûna aşîtiyek rastîn û bi istiqrar ne mumkun e; di vê nuxte de hemû kesen besdar panelê mutefiq bûn.

dan bike? Li gel bangâ serokê Kurden ji Sekreterê Koma Milletan re, mesela Kurden neket rojeva guftigoyen aşîtiyê, çima? Hebûna nûneren Koma Milletan dikare tesîrek çawa li rewşa Kurden bike? Gelê Swêdî û dewleta Swêdî ji bo piştgiriya Kurden dikarin ci bikin?...

Hemû ahaftvanen besdar panelê, li herêmê rewşa iro, netica şer li ser tevgera Kurd û talûke û xeteren di rojê pêş de dikarin derkevin pêş wan, ji gelek alî ve munaqeşe kirin. H. G. Frank got; gelek mumkun e ku kuştin û surgûnkirina Kurden zêdetir bibe. Û loma jî iro, ew roje ku Kurd ji xwe re mux-

alefetê û raya gişî çê bikin. S. Hjérten: Ez bi xwe pirne pesimist im. Ji ber ku ji 1975'an û vir de Kurden gelecek tecrübe girtine. Ya din jî, nuha nûneren Koma Milletan li wir in, ji bo Kurden ev jî imkanek bas e.

TEVGER: Heta nuha li ser rewşa Kurden ya iro, bêyi Lîbyayê tu dewletekê ditina xwe ya resmî eşkere nekiriye. Şerê Iran û Iraqê bisikine jî wê têkoşîna gelê Kurd dom bike...

Di dawiya meha Tirmehê de ji alî kesen guhîdar ve hin pirs hatin pirsin û bersiv hatin dayin. Panelê gelekî bala guhîdaran kişand. Nêzî 100 kesî di panelê de besdar bûn.

## Ji hefsên Diyabekir surgûn!

Piştî berxwedanen hefsên Diyabekir ku hemuyêwan jî bi sefirazî bi ser ketin, faşistên kolonyalîst dixwazin kesen serokatiya berxwedanen kirine, surgûn bikin.

Piştî bûyera roja duduyê Eydiya Qurbanê (25.07.1988) ku li ber deriyê hefsa girtiyen siyasi, di navbera xelkê û polîsan de şer derket, idara hefsa siyasi û sivil dest bi surgûna girtiyen kirin.

Di dawiya meha Tirmehê de ji hefsa siyasi, tevî Mehdi Zana 12 kesen girtî surgûnî hefsa Eskişehirê kirin. Harûn Efe, yê ku serokatiya berxwedana hefsa sivil kîribû, surgûnî hefsa Elezîzê kirin. Li gor nûçeyen ku vê dawiyê me sitend, Mehmet Şehmus Cibrân jî wê di van rojênen nêzîk de surgûn bikin.

Surgûnkirina girtiyen di nav xelkê de bi ne xwesi û bi ne razibûn tê axaftin.

## Raxistina li ser qetliema Helepçê bal kişand

Resam Dara Mihemed roja 11'ê Tirmehê resmîn xwe li Malbenda Çandî(Merkeza Kultur) a Sovyetî li Şamê raxist. Raxistinê gelek roj dom kir û ji aliye gelek kesan ve hate temasikirin.

Tevaya wênan 46 bûn. 19 jê, yên mezîn bûn û 27 jî yên biçük bûn. Yên mezîn bi taybetî li ser bûyera Helepçê bûn, yên biçük jî li ser bingehêne pêşmergeyan û li ser deveren azadkirî bûn.

Raxistina van wênan carekê din bûyera bi serê miletê Kurd de hatî û rewşa deveren azadkirî raxist ber çavên gel û bala temasikanan gelek kişand.

Hunermed Dara Mihemed, di sala 1963'an de li bajare Silêmaniye, li başûrê Kurdistanê hate dinê. Sala 1985'an li peymangeha(enstituya hunerên ciwan li Silêmaniye xwendina xwe bi dawî anî. Di hemî festîvalen peymangeha hunerên ciwan de besar bû. Di sala 1985'an de raxistîne şexsi li Iraqê çêkir. Endamê sendiqâ hunermendan li Silêmaniye, endamê desteka nivîskar û rojnamevan û hunermendan demoqrat yên Iraqê ye.

## Di Konferansa "Nordîsk Forum" ê de Jinên Kurdan jî Besdar Bûn

Di navbera 30'ê Tirmehê û 7'ê Tebaxê de li paytexta Norveçê li Oslo'yê bi navê "Nordîsk Forum" (Forûma Skandinavya) konferansek jinên welatên Skandinavî çêbû. Di konferansê de xeynî jinên welatên Skandinavî, jinên multecî ku li welatên Skandinaviya dijîn jî hazir bûn. Ji Komela Demokratîk a Jinên Kurd a Stockholmê jî du delege di konferansê de besar bûn û dûr û dirêj li ser pirsên jinên Kurden Konferans agahdar kirin.

Di 7 rojê Konferansa jinan ku li Unîversîta Osloyê çêbû, nêzî heft hezar jin hazir bûn û li ser pirsên xwe yê aborî, civakî, siyasi, kulturi û h.w.d axiftin û munaqeşe kirin.

Roja sisîyê Konferansê di panêla jinên Swêdî de bi navê Kurden Sekreterâ Komela Demokratîk a Jinên Kurd Hulya Guzel ahaftinek kir. Di ahaftina xwe de ew li ser rewşa Kurdistanê, qetliama Helepçê û li ser rewşa jinan sekinî. Di ahaftina xwe de weha got: "Welatê me Kurdistan di bin îşxala kolonyalîstan de ye. Jinên me xeynî zulma cînsî û zulma çînî di bin zulma netewî de ye jî. Li Kurdistanâ Tirkîyê ne tenê em bi zimanê xwe nikarin bixwînin û bînîvisin, em nikarin bi zimanê xwe bi axîfîn jî. Ev tiş li ser şaxsiyeta jinên Kurd pîr tesîrek dike, rewşa wan



Sekreterâ Komela Demokratîk a Jinên Kurd H.Guzel di civînê de diaxife.

hîn xirab dike. Li Kurdistanâ Iranê û Iraqê jin û zarokên me di bin siya şer de dijîn; gund û bajarên me têb bombakirin û gelê me bi tevayî tê kuştin. Qetliama Helepçê yek ji wan e."

Sekreterâ Komela Jinan li ser muşkulên jinên Kurden ên Swêdê dijîn jî sekinî, got: "Di navbera jinên multecîyan de bêtir jinê Kurd zahmetîye dikşînîn. Dewletên kolonyalîst li Swêdê jî, nahêlin em muesesan çêkin. Wexta li Swêdê krêş ji zarokên Kurden re vebû hûn dizanin reaksiyona dewleta Tirk li dijî kreşê çawa bû."

H. Guzel di dawiya ahaftina xwe de bi navê jinê Kurden bang ji xwişkên xwe yê welatên Skandinavî kir û ahaftina xwe weha xelasîya jinên Kurd bi azadî kir: "Li dijî dijiminê me yê kolonyalîst dengê xwe bi dengê me re bilind kin,

□

### Kitêbxana Sara

▲ Kitêb, kovar û rojname têvel û bi çend zimanê cewaz.

▲ Kitêb û kovarê Kurdi çap dike û belav dike.

Bixîr hatin.

Dalagatan 42, 113 24 Stockholm

Tel: 08-33 12 29

T-BANA ODENPLAN

## 107 sal berê di rojnameke Bûlgarı de nûçeyek li ser Serîhildana Ubeydullahê Nehri

107 sal berê di rojnameyek Bûlgarı de li ser serîhildanek Kurden nûçeyek hatiye nivisandin. Hercîqas di nûça rojnamê de navê serîhildanê û navê serokên serîhildanê nayê nivisandin jî, lê him ji tarîxa rojnamê û him jî ji naveroka wê tê fehmîkirin ku ev serîhildan, serîhildana Ubeydullahê Nehri ye.

Rojnama ku ev nûçe nivisandiye navê wê "Bûlgar" û di sala 1881'ê de li bajare Rûsî derketiye (Rûsî bajareki Bulgaristanê ye). Ev rojnama di hejmara xwe ya 331'an di 29'ê Çileyê Paşîn(Ocak) 1988'în de ev nûçe weşandiye.

Nûçe ewa ye:

"Telgirafa Viyena: 27'ê Çileyê Paşîn. Nûçegîhanê siyasi ji Stenbolê agahdar dike. Heger hukûmeta Tehranê efûyek temamî ji wan re derke, wer xuyaye ku wê serekên serîhildana Kurden vegerin warê xwe yê Iranê. Nîşbi be jî ev li gora peymana navbera Hukûmeta Babî Ali û sefirê Iranê yê Stenbolê jî li cî ye. Hukûmeta Babî Ali selahiyetek nedîfî daye zabit Heyder Efendi û ew şandiye ba serekên Kurden ku serîhildan e".

Donço İvanov

# Bersîva Bendewariya Gel

**Îkram Delen  
Berpirsiyarê Ala Rizgarî**

**Piştî damezrandina Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER) me, him dîtinê partî û rëxistinê di nav TEVGER'ê de û him jî dîtinê kes û muesesên Kurdan li ser TEVGER'ê pirsî.**

**Em di vê hejmarê de dîtina berpisyarê Ala Rizgari, heval Îkram Delen pêşkêş dikan.**

Rojnama Armanc dipirse ku "Dîti-na we ya li ser damezrandina Tevgera Rizgariya Kurdistan ci ye?

Li gor min, pêwîste ev pirsiyara berî ji wan kesen ku hêj di nav TEVGER'ê de cî negirtine bête pirsin. Ji ber ku ez bi xwe jî endamê rëxistineke damezrênerê TEVGER'ê me. Eger ji vê xebata hevbaş û ji vê yekitiyê hêviyek me tunebe û ji bo têkoşina Kurdistanê gaveke pêwîst hesab ne kiri bûya, beguman me di nava vê xebatê de cî ne digirt.

Berî hertiştî di vê merhela têkoşîna rizgariya netewî ya Kurdistanê de hevkariyek weha pêwîste an na? Mervikare bersiva vê pirsiyarê bi şiklekî negetîvî bide. Bi salan e ku ci gelê Kurdistanê be û ci jî yek û yek gruben siyasi bin, daxwaza hevxebat û yekitiyan dikirin. Ji bo herkesi diyar bûku heya di nav hêzen Kurdistanî de hevkarî û hevxebatî neyê raçandin, têkoşîna gelê Kurdistanê nema dikare gavêne mezin bavêjin. Hemû kes ê ji bo destxistina sengeren bingehî û helkirina aloziyên di nav gurûban de, riya hevxebatîyê işaret dikir, û dikan.

Eger meriv rewş û rastiyên hêzen siyasi yên Kurdistanê tahlîl bike, li hember neyaran; iro, yekîti ji her wextî zêdetir pêwîstiya xwe dide hîskirin. Lazime em rastiyên xwe jî vekîfî daynin û rewşa xwe venesêrin. Bi taybetî pişî 12 Îlonê û vir de, problemen di nava hereketê de hemû grûb û partî lawaz kirin. Viya jî yek û yek sînorên bizava hêzan teng kir, fonksiyona wan ya li ser raya giştî kêm kir. Bi giştî ji bo qezencirina baweriya gel û pêşveçûnê, beriya hertiştî lazime hêzen siyasi baweriya hevxebatîyê bi hev bînin, nuqtîn xwe yên hevbes diyar û ron bikin da ku bikaribin bi hev re bimeşin û pêşengîya gel bikin. Helbet tenya ji ber lawazbûyinê, pêwîstiya yekîti û hevxebatîyê parastin ne di ciyê xwe de ye. Aya ku do, hevkarî û hevxebatîyek xwedîprogram di nav hêzan de peyda bûbaya, yek ji ew sedemên perçebûyinê ji holê radi bû. Di dîroka têkoşîna gelê me de çendin caran ispat bûye ku, ji hevnegirtina hêzen welatparêz neyaran feyde dîtiye. Bi serê xwe her hêzekê xebateke pir aktîv û qehremanane domandi be jî; disa ji ji ber ser û nelihînevhatînê daxili astengen mezin derketine ser riya wan.

Iro hemû partî û gurubêni siyasi yên Kurdistanâ Başûr hêj di nav TEVGER'ê de cî ne girtine. Lî baweriya me ew e ku di riya dostaniya politîk, parastina aştiyê di nava van gurûban de, tolerans nîşandan ji bo hevdû û temûlkirina hev, ew ê di rojîn pêş de

zemînê lihevhatin û hevxebatîyê ferefir bike. Ji xwe TEVGER jî bi vê baweriyê bangî hemû terefan dike û politikayek bi vî rengî dipejirîne.

Ji aliye din ve ci ji bo gelên Kurdistanê û ci ji bo raya giştî ya dinê yek û yek daxwazên gurûban tiştek e, bi hev re xwedîdaxwaz û programbüyîn tiştekî din e. Kêmtir an zêdetir ji bo merhela şoreşa netewî-demokratîk ew daxwazên TEVGER'ê daye ber xwe, her hêzek Kurdistanî bi serê xwe diparast. Lî ev di raya giştî de, di platformen navnetewîde tenê wek daxwazên beşike gelê me (an jî ya gurûbekê) dihate qebûlkirin. Lî ji iro pê ve ev baweriya ku ne li feyda me bû, ew ê bête şikandin. Tiştekî diyar e ku bihevrebûyîn û xwedîprogramke hevbesî deriyen platformen diplomatîk yên navnetewî jî ji bo herekata Kurdistanê veke. Dost jî û neyar jî wê bîzanibin daxwaza gelê Kurdistan ci ye, an jî hemû hêz û gurûbê Kurdistanê bi hev re ci dixwazin, ji bo ci ser dikan, ew ê bi şiklekî zelal têbigihen û ciyên xwe diyar bikin.

Neha jî ez dixwazim li ser bernama TEVGER'ê du sê nuqtan bidime diyarkirin.

Baweriya merivan, li ser gurûbekê (ci komel, ci partî an jî enî) pozitîv an jî negatîv, bi du curan peyda dibe.

1- Program, stratejî û armanca wê grubê,

2- Kirinê (praktîkîn) wê.

Li vir em dikarin armancen TEVGER'ê daye ber xwe li ser bisekinin û bibin xwedîdîtimeke negatîv yan jî pozitîv. Yekemcar e ku li Kurdistanâ Başûr piraniya hêzen siyasi li ser statuya Kurdistanê digihêjîne formulasyonek zelal û li hev dikan. Bêguman ev gaveke baş e. Programa TEVGER'ê daxwaza welatekî serbixwe û demokratîk dike, bi salan e ku di vî warî de tevlihevi rî li hevkariyan dijirt; an jî yek ji wan sebebêni lihevhatînê bû.

Dîsa ji bo Kuristaneke serbixwe ci rî û rîbaz pêwîst in? TEVGER'ê ev jî ron kiriye. Bi gotineke din hêzen şoreşer û welatparêz li hev kirene ku li gel hemû cure xebata siyasi ji bo şerî çekdaryen rizgarîwaz jî, bo damezrandina hêzen pêşmerge û amadekirina van zirûfan jî programek daye ber xwe.

Li gel hevkariyên kevn, yek ji wan ferqen TEVGER'ê ev e ku vê yekîtiyê çarçewa xwe tenya bi gurûb û partîyên siyasi ve ne hiştiye. Di destûra xwe de rî dide ku komel, muesesên demokratîk yên kîlevî jî (komelîn karker, jîn, xwendevan û h.w.d) di nav organen vê yekîtiyê de cî bigrin. Dîsa rî dide ku di kongra xwe de nûneren van

komelîn demokratîk û kesen serbixwe jî li gel nûneren hêzen siyasi besar bin û birêvebirê TEVGER'ê bi hev re hilbijérin. Ev jî ji bo xebata rizgariya Kurdistanê riya qonaxeke nû vedike ku komel û hêzen demokratîk yên kîlevî jî, fonksiyona xwe ya li ser desthilatê dikare bi kar bîne. Ku ev daxwaza bi babetekî rast û aktîv bi cîbibe, ne tenê endam û layengirê hêzen siyasi herweha hemû ref û çînên cûr be cûr yên Kurdistanê jî di eniya rizgariya netewî ya Kurdistanê de bi şiklekî demokratîk li hember neyaran bi hev ve dikelijin.

Wek hemû têkoşîna netewî yên rizgarîwaz, bi derkirina kolonyalîstan û îlankirina dewleta xwe tenê, problemen Kurdistanê dawî nayen. Piştî rizgariyê jî bi hezaran problemen civakî hene ku bêne helkirin. Eger nûneren ref û çînên Kurdistanê li ser rî û rîbâzên helkirina van probleman ne li hev bin, an jî riya xebata bi hev re ne afîrandibin, aloziyên pirr kûr û nexweş derdikeyne pêş. Û ji bo pêşveçûna civakî astengen mezin çedîbin. Wexta meriv çav li destûr û programa TEVGER'ê digerîne, ev hêzen şoreşer û welatparêz li ser rîbâzake demokratîk çerçeva karûbarê xwe ron kirine. Weki, piştî damezrandina hukûmeteke muweqet amedekirina qanûna esasî, helbijartina meclîsê, ji bo bijartin û helbijartînê azadî bo hemû hêzen şoreşer û welatparêz û bi riya meclîsê birêvebirina desthilatê. Ji bo serketina şoreşa netewî demokratîk ya gelê Kurdistan ev esasiyana ci ji bo hêzen sosyalist û ci jî ji bo hêzen netewî, tixûbê bi hev re meşînê ye.

Helbet hîc programek sedî sed rast û bêkemâsî nîne. Eger em kûr û dûr lê biggerin em dikarin çend kêmasyîn programa TEVGER'ê jî derxin pêş. Ya girîng ev e ku di meselîn esasî de van gurûbana li hev kiriye an na. Û program bi giştî daketiye binê sînorê mînimûm(asgarî) an ne. Ji hêla din ve ev nayê vê manê ku programek bo her dem û bo her şertî ye. Ev programa TEVGER'ê jî di roj û şertîn nuh de dikare xwe biguherîne. Lî ya girîng ev e ku ev guherîn ber bi pêş e, an ber bi paş. Ji xwe di têkoşînê de her bernama ku li gor şert û zirûfan xwe nû neke, şansê serketina wê kêmîtir dibe. Li gor me, ev programa ku vê yekîtiyê daye pêşîya xwe û qebûl kiriye; bersiva şoreşa netewî-demokratîk(jî bo Kurdistanâ Başûr) dide.

Îro li ser praktîka TEVGER'ê sekinîn û tiştegotin, ne mumkun e. Lewra ew hêj nû hatiye damezirandin û nû dest bi karûbarê xwe kiriye. Viya jî emî di rojîn pêş de bi hev re bibîn. Ji xwe ne programek bê praktîk ne jî praktîkek bê program şertîn serketinê bi dest dixe. Ku TEVGER jî li gor programa pêş xwe bi awayekî aktîv, kîrin û xebatîn xwe bidomîne, em bawer in ku ew ê di demeke kurt de, rehîn xwe di nav gel de ber de û bibe hêzeke maddî.

Stînyen me

**Lawikê Berrîvanî**

**Prometheus û Siyamedê Silîvi**

Di mîtolojiya Grêkiyan de geleksane hene. Ji vanan yek ji efsena Prometheus, xwedanê agir e. Ew, ji asîmanan agir didize û dide insanan. Lî xwedayê wê demê ji vê alikariya wî bi insanan re geleki aciz dibin, li hember dûzana xwe wek serihilda-nekê qebûl dikan. Lema ji li Prometheus têne zezebê. Xwedayê Grêkiyan yê herî mezin Zeus, cezaki pirr mezin dide Prometheus; wî li pişt çiyayê Qaf bi zinciran bi zinareki ve girê dide.

Lî belê Zeus bi vî cezayî jî qîma xwe nîne, her sibe qertelek dihere bi nikilê xwe sînga Prometheus qui dike, kezaba wî derdixe û duxe. Piştî vê, bi şev, kezeba Prometheus ji nuh ve çê dibe û roja din qertel cardin tê dixwe. Ev işkence demekî bi vî hawî dom dike. Heta ku qehremanê Grêki yê bi nav û deng Herkul, diçê çiyayê Qaf û Prometheus dibîne. Xwe dide bende qertel, qertel dike...

Herkul bi vê qehremaniya xwe Prometheus ku agir û ronahî dabû insaniyetê ji işkencê û ji ezêb xelas dike. Bi rizgarbûna Prometheus, insaniyet bi xwe jî ji tarîtiyê derbasî ronahiyê dibe... Ya muhîm, Prometheus li paş çiyayê Qaf di wî halî de namîne...

Di mîtolojiya me Kurdistan de jî çiroka Siyamedê Silîvi û Xecê bi hin aliyen xwe bi vê efsana Prometheus dimîne(disibe) Siyamed û Xecê li ser Çiyayê Sipanê Xelatê ne... Serê Siyamed li ser çonga Xecê ye... Xecê bê hemdi dikene. Siyamed dibêje tu bi serê min kenîya? Xecê dibêje na, ez bi wî pezkuvî hanê kenîyam; ku bi wê bejna xwe ya biçûk zora nêriyê mezin bir û xezal jê stend... Te ji wek wî, ez bi zorê stendim...

Li ser van gotinê Xecê, Siyamed dide pê pezkûvî. Li ser devê zêrzemiyekê bi tîrekê ve pezkûvî werdigerine. Dema şerjê dike pezkûvî xwe diperpitine û Siyamed di binê zêrzemiyê werdibe. Kelemeke wek şûr di zêrzemiyê de ye, li pişta wî dikeve di zik re derdikeye. Dûre Xecê jî xwe davêje zêrzemiyê...

Li gor efsaneyê ji wê rojê û vir de, her sal rojekê buharê serê wê kelemê kulîkekê vedike û ruh bi Siyamed û Xecê de tê. Lî tam wê gavê pezkûvî tê, wê kulîkê dixwe û Siyamed û Xecê jî ji nuh ve dimrin. Ü sal bi sal wisa dom dike...

Li vir ya bala meriv dikşîne, di efsanê de "Rustermekî Zal" ranabe narc wek Herkulê Grêkiyan Siyamed û Xecê li serê Çiyayê Sipanê Xelatê ji binê zêrzemiyê xelas nake... Ev her du evîndarê mîtolojik her û her di wî halî de dimînin.

Wek teşbîh, meriv dikare bibêje qedera Siyamed û Xecê trajediya gelê Kurd bi xwe ye...

Ji bo ku ev trajedi dawî bê, Siyamed û Xecê û welatê wan rizgar bibe do Herkuleki efsanewî derneket, lê, gelo Herkuleki iro (ku ew jî parti û rëxistin in) ji bo vê yekê çer dikin? Bi kurtî:

Wek seyvanen ku hin xezal ne girtine lê li ser parkirinê li hev nekin, ew jî li ser Kurdistanâ bindest, welatê Siyamed û Xecê li hev nakin. Her "Herkulek", Herkuleki din ji xwe re raqîb û xebata wî jî li hember xebata xwe reqabet dibîne... Lî netice, welatê Siyamed û Xecê bi hemû "Herkulen" xwe ve her bindest e...

## Lêkolîn

## Şukur Mistefa û Wergerên Wî

**S**ukur Mistefayê ku Kurdên Iraqê ji nêz ve wî nas dikan û bi dehan werger(tercume) û ji sedî zêdetir meqaleyên wî xwendine, çi heyf ku li ba me nayê nas kirin. Emê di vê vivîsê de Şukur Mistefa û wergerên wî bi alikariya agahdariyên ku me jê bi nivîskî girtine, bi kurtayê bidin naskirin.

Şukur Mistefa di sala 1927'an de li gundekî nêzî Kerkûkê ji diya xwe bû. Bavê wî Mistefa û kalkî wî wek çeqmaqsaz(hos..teyên tivinga) hatibûn naskirin. Bavê wî bi 'eslê xwe ji Silêmanyê ye.

Şukur Mistefa di heft saliya xwe de medreseyê de dest bi tehsîla xwe dike. Li medresê bi Quran û dersên dînî re Farisî û Tirkî jî dixwîne. Dû re wek "feqî" li Kurdistana Iraqê li herêma Soran, Behdînan û li gelek gund û bajareñ Kurdistana Îranê tehsîla xwe ya medresê didomîne. Heta sala 1946'an jiyana wî ya feqitîyê dom dike. Di 1947'an de tehsîla xwe ya medresê(bi gotina wî feqitîyê) berdide diçe Bexdayê. Li wir, li mekteba El-Hîdaye-1 İslâmîye dest bi xwendinê dike. Di sala 1949'an de dikeve Fakulta Şerîta İslâmî ya Bexdadê û di 1955'an de jî vê fakultê diqedîne.

Piştî viya li Iraqê li gelek mektebêna cuda, mamostatiya zimanê 'Erebî dike. Di sala 1970'yî de jî li Kurdistana Iraqê, li Wezaret "Pirsên Bakur", ji bo perwerdekiya xwendina Kurdî dest bi xebatê dike. Di sala 1974'an de dibe sekreterê Korrî Zanyarî Kurd (Akademiya Zanistîya Kurdî). Di sala 1978'an de ev akademî tê girtin û navê wê tê guherandin, dibe Korrî Zanyarî Iraq. Beşê wê yê Kurdî jî dibe beşekî bi vê akademiyê ve girêdayî. Şukur Mistefa nuha di vî beşî de wek pispor (muterhesis) kar dike.

Şukur Mistefa hema hema, hemû lehçeyen Kurdî dizane. Wekkî ku dide diyarkirin bi taybetî Kurdiya Başûr(Soranî) û Goranî (Hewramî) hîn baştır dizane, Kurmanciya Bakur, Lurrî û Kelhurî baş fahm dike, ji demekî vir de ye ku li ser zaravê Dimili(Zazakî) jî dixebe. Û wî van salêna dawîn, di çend kovar û rojnaman de li ser Dimili ev nivîsen jêrin nivîsanide:

1) "Goranî Kurdiy Zazayî" (Stranê Kurdiya Zazayî), kovara Karwan, Hewlîr, hejmar: 38 (1985), rûpel: 107-112)

2) "Ferhengî Dimilkî-Tirkî" (Ferhenga Dimilkî-Tirkî), rojnama Hawkâri, hejmar: 902

3) "Berkutê li ser Zarî Zazayî" (lêkolînek li ser zaravaye Zazayî), kovara Roşinbîrî Nwê, hejmar: 115 (1987)

Şukur Mistefa bêyî Kurdî û 'Erebî, Tirkî û Farisî jî bi qasî ku ji van zimanan karibe tercume bike dizane.

Gelo Şukur Mistefa çawa Tirkî fêr bûbû? Me ev yek jê pîrsî. Bersîva vê pîrsî wisa da: "Li Kerkûkê dema ku min li medresê di-xwend min Tirkî jî xwendibû... Min di piçûkaniya xwe de bavê xwe winda kiribû. Esas Tirkî ez ji jinbiraya xwe ya ku ji Tirkêne Kerkûkê bû, fêr bûm... Di zaroktiya xwe de min çiroka Kerem û Asliyê, çirokêne Dede Korkut, Dadaloglu, Aşik Garip, Köröglo li gel kitêbên Tirkî wek Ahmedîye û hin şî'ren şairên Tirkî wek Namik Kemal jî xwendibû. Bi viya re min inşa(dersek wek kompozisyonê-Malmîsanî) jî xwend. Min vana hemû bi herfîn 'Erebî xwendibû, di dû re min dest bi xwendina Tirkî ya bi herfîn Lafînî kir. Piştî demekî ez fêrî lehça Azerî bûm. Lehça Azerî û lehça Tirkmanî a ku li Kerkûkê tê peyvandîn, gelekî dişibîn hev. Daviyê ez Özbekî jî fêr bûm..."

Gelo Şukur Mistafa qet çûye Tirkîye hatîye yan na û cîma hîn bêtir ji Tirkî kitêban werdigerine?

Bersîva wî ev e: "Ez yanzdeh caran çûm Tirkîye... Min Nazim Hikmet dît..Di 1955'an de li Varşovayê tevî Mîhrîcana Ciwanan (Xortan) bûbûm... Ez li Bûlgarîstanê mam... Bi Tirkêne devera Deliorman'ê re têkîlîyên min çêbûn... Li devera Henderan'ê ez di nav Azeriyan de mam.

Paşê, Şukur Mistafa weha di-bêje: "Ez, ne dostê rejima Tirkîye

û ne jî dostê dijminê hêzên gel im lê dostekî gelê Tirk im".

Li gor ku Şukur Mistafa di-nivîse ew di nav nivîskarêne Tirkîye de ji eserên van nivîskaran hez dike: "Yaşar Kemal, Kemal Tahir, Orhan Kemal, Fahri Erdinç, Sabahattin Ali, Ömer Seyfettin, Orhan Weli..." û dom dike: "Ez bi taybetî ji edebiyata Azerî pîrr hez dikim"

"Yaşar Kemal yek ji nivîskarêne Tirkîye ye ku ez ji kitêbên wî pîrr hez dikim. Ji ber ku ew bi xwe Kurd û di eserên xwe de geleki qala jiyana Kurdan dike. Şâfrekî Tirkî jî ku ez pîrr jê hez dikim Nazim Hikmet e. Him ji ber ku min bi xwe ew dîtiye, him jî ji ber ku ew şairekî dostê merivatiyê ye ez jî hez dikim. Ji edebiyata Tirk hîn bêtir min eserên van wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Peyamî Bîmaran, yê ku wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Sirûşt Hener e Yan Hunermend?, yê ku ji 'Erebî wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya, Bexdad, 1986

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Peyamî Piran, yê ku wergerandiye Kurdî: Refîq Hilmî, Mûsil, 1934, 21 rûpel

Herçi Şukur Mistafa ye, ne ji zimanekî duduyan lê rasterast ji Tirkî kitêban werdigerine. Li jîr, em navê hin wergerên Şukur Mistafa dinivîsin:

- Nazim Hikmet, Kelleser (Kafatası), yê ku wergerandiye Kurdî: Saleh Rêbwar, Stockholm, 1986, 87 rûpel

- Yaşar Kemal, Hemedok (Ince Memed), yê ku ji Farisî wergrandiye Kurdî: Ebdullah Hesenzade, Bexdad, 1986, 552 rûpel

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Wutebiçolekan, yê ku wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya, Bexdad, 1885, 111 rûpel

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Peyamî Bîmaran, yê ku wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Sirûşt Hener e Yan Hunermend?, yê ku ji 'Erebî wergerandiye Kurdî: Farûq Resûl Yehya, Bexdad, 1986

- Bedi'uzzeman Saidi Nursi, Peyamî Piran, yê ku wergerandiye Kurdî: Refîq Hilmî, Mûsil, 1934, 21 rûpel

- Ziya Gökalp, Namîlkey Komelatî, yê ku wergerandiye Kurdî: Refîq Hilmî, Mûsil, 1934, 21 rûpel

- Ziya Gökalp, Namîlkey Komelatî, yê ku wergerandiye Kurdî: Refîq Hilmî, Mûsil, 1934, 21 rûpel

D- Ji kitêbên ku ji 'Erebî wergerandiye Kurdî:

Şukur Mistafa ji bo ku di distanîn Kurdî de bêx xwendin, ji 'Erebî gelek kitêb wergerandiye Kurdî.

E- Ji kitêbên ku ji Tirkî û ji Azerî wergerandiye 'Erebî:

1- Huseyîn Kurdoğlu Elişanev, Şîri Goran

Ev xebat tezeke doktorayê ye ku li Bakuyê li ser şî'ren şairê Kurd, Goran hatîye nivîsin. Şukur Mistafa ji Azerî wergerandiye Kurdî.

2- Mêjûyî Baban

Ev kitêba bi Osmanî ku nivîskarê wê nayê naskirin, li ser dîroka Kurdên Baban hatîye nivîsin. Şukur Mistafa ji Osmanî wergerandiye Kurdî lê hîn çap ne-bûye.

## Malmîsanij

7- Ji Aziz Nesin 25 çîrok

8- Abdülletif Benderoğlu, Aci Benim Umut Senin Kasırgalar Hepimizin (destana manzûm)

9- Mêjûyî Kurd le Sedey Şans-dehem da

Tezek doktorayê ye, li Bakuyê li ser Şerefnamê hazır bûye û besê yekem ê wergera Kurdî di kovara Korî Zanyarî Iraq'e de hatîye weşandin.

10- Yaşar Kemal, Giyay Nemiran (Ölmez Otu)

Hîn nehatîye çapkirin.

B- Ji kitêbên ku ji Farisî wergerandiye Kurdî:

Mestûre Xanumî Erde-lan(1805-1848) yek ji şâîr û nivîskarê Kurdan ên herî navdar e. Ew kitêba wê ya ku Şukur Mistafa ji Farisî wergerandiye, kiriye Kurdî hîn çap nebûye.

C- Ji kitêbên ku ji 'Erebî wergerandiye Kurdî:

Şukur Mistafa ji bo ku di distanîn Kurdî de bêx xwendin, ji 'Erebî gelek kitêb wergerandiye Kurdî.

D- Ji kitêbên ku ji Kurmanciya Bakur kiriye Kurmanciya Başûr (Soranî):

'Ereb Şemo, Dimdim, Bexdad, 1984, 316 rûpel


E- Ji kitêbên ku ji Tirkî û ji Azerî wergerandiye 'Erebî:

1- Huseyîn Kurdoğlu Elişanev, Şîri Goran

Ev xebat tezeke doktorayê ye ku li Bakuyê li ser şî'ren şairê Kurd, Goran hatîye nivîsin. Şukur Mistafa ji Azerî wergerandiye Kurdî.

2- Mêjûyî Baban

Ev kitêba bi Osmanî ku nivîskarê wê nayê naskirin, li ser dîroka Kurdên Baban hatîye nivîsin. Şukur Mistafa ji Osmanî wergerandiye Kurdî lê hîn çap ne-bûye.




Qapaxa kitêba Nazim Hikmet, Dastanî Şêx Bedreddîn Kurrî Qazî Sîmavne.



Qapaxa romana Yaşar Kemal, Kwêroxlî



Qapaxa romana Yaşar Kemal, Zewî Asin û Asman Mis



Qapaxa romana Yaşar Kemal, Teneke

Universita Stockholmê li ser Kurdên li Swêdê lêkolînekê çê dike. Umer Şêxmûs, ku li vê Universite mamoste ye, ew jî di vê porojevê de wek pisporekî kar dike. Heval Bavê Diljen û Zinarê Xamo li ser vê proja Universita Stockholmê bi mamoste Umer Şêxmûs re hevpeyvînek dirêj çê kirin. Em bawer dikin ku xwendevanen me wê vê hevpeyvînê bi zewq bixwînîn.

**Armanc:** Kek Umer him xwendevanen me û him jî gelekên Kurdan te dînasîn. Lê dîsa jî ji bo ku xwendevanen me yên xort jî, te ji nêz ve nas bikin ji kerama xwe re hinekî behsa jîyana xwe bike?

**U. Şêxmûs:** Ez di 7'ê Sibata sala 1942'an de li bajarê Amûdê li Kudistana Sûriyê ji diya xwe bûm. Bavê min û diya min herdu Kurd in. Û di nav bajarê Amûdê de naskirî ne.

Heta emrê 12 salî ez li Amûdê bûm. Lê wek bajarê din yên Kurdistanâ Sûriyê û Kurdistanâ Tirkiyê di salên 1950'î de ne mekteba ortê û ne jî mektebênilind tunebûn. Ji ber wêya, ji bo xwendina ortê û gîmnasyûmê ez çûm bajarê Helebê. li wir di emrê 17 salî de, pişti ku Partiya Demoqrat a Kurdistanâ Sûriyê hat danîn(di sala 1958'an de bû) ez çûme nav rîzê PDK-Sûriyê. Di gel piraniya xortên wê wextê bi navê Komela Xwendevanen Kurd tiştek hatibû danîn. Yanî ewa bûbû esasekî ku xortan di wir ra bînin nav hêzên Partiyê. Ewil em ketin nav Komela Xwendevanen Kurd û dûra ketin nav partiyê. Û ji 1958'an wir da ez her di nav hêzên Partiyê de bûm û ez zû jî ketime Komîta Helebê. Sala 1960'î de cara ewil ez hatim girtin; ji alî rejîma Nasir. Wê demê Sûriye û Misir yek bû. Girtinek fireh di nav partiyê de çebû, piraniya serokatiya partiyê hatin girtin. Ez jî yek ji wan bûm. Lê girtina min hewqas dirêj najot, gelekî kurt bû. wek hemû welatê din ên Rojhilata Navîn, meriv dikare xwe bi peran xilas bike. Gava ku hevalan zanibûn min di zîndanê de muqawemet kiriye, îtfraf nekiriye; piraniya Komîta Merkezî û Polît Buro ku ew jî di wira da bûn, gotin ku"te tiştekî baş kiriye. Li ser viya berdewam be, kesekî din jî navê te nedaye. İmkan heye ku tu derkevî, tu yê karibî zêdetir kar bikî. Û ew bû di netîca wêya pişti du heftan ez ji zîndanê derketim, bêl ku bikaribin tiştekî ispat bikin. Min serokatiya veşartî agahdar kir. Wê çaxê tenê hevalik ji Polît Buro li derive mabû, ewen din gişt hatibûn girtin. Ew jî wê çaxê ne li wira bû, yan ewê jî bihata girtin. Ew wê çaxê çûbû Iraqê.

Di dawiya 1961'ê de min xwest ku derkevîm dervayî welat, ji ber ku min xwendina xwe xelas kiribû. Lê hukûmeta Sûriyê pasport neda min.

Di dûrê KÜDETA çebû, Sûriyê ji Misir cuda bû. Rewseke wilo hat ku min karibû pasportê bistînim. Û ez hatim derive.

Li derive li Îngilistanê ji 1962'an heta

1967, ez li wira bûm. Wê çaxê îtîfaqeş di navbera PDK-Sûriyê û ya Iraqê de hebû ku endamên herdu rîxistinan li deriveyî welat bi hevre kar bikin. Û na-meke wilo dan min û ez hatim nav rîxistinan derveyî welat.

Ez bûm mesûlê rîxistinan Partiyê li Îngilistanê. Her wiha ez bûm endamê Komîta Ewrûpa ya Komela Xwendevanen Kurd li Ewrûpa. Wê çaxê navê wê, Komela Xwendevanen Kurd li Ewrûpa bû. Ji sala 1962 heta 1965'an, ez endamê Komîta Komela Xwendevanen û endamê Komîta Ewrûpa ya tanzîmatê Partiyê bûm û mesûlê rîxistinan jî bûm.

Bi dizî tiştekî me hebû ku bi navê Temsila Şoreşê bû. Ew jî, ji ber ku hinek dîplomatêni Kurd wê çaxê li deriveyî welat bûn. Ew jî bi dizî di nav wê

Umer Şêxmûs:

## 'Ji ber ku Kurd jî car rewşen wa'

1967'an muhleta wê hebû. Pişti ku pasaporta min kîşandin, cînsiyeta min jî kîşandin, min dawa îltîca li Îngilistanê kir, lê Îngîltîre qebûl nekir. İcaza kar dan min, lê ne hazır bûn ku îltîca min qebûl bikin.

Hinek havalên Kurd li vir, li Swêdê hebûn, nuh hatibûn. Ew jî Kurdên Iraqê bûn û di wextê xwe de li Tirkiyê hatibûn girtin. Di sala 1963'an de ji nav wan 23 kesan, wek İbrahîm Mam Xidir, Cemal Elemdar, Seîd Abdirehman û ew têkoşerên Kurdistanâ Tirkiyê Mûsa Enter. Ew hatibûn vira û li vir hatibûn qebûlkirin. Min hinek ji wan nas dikirin. Gotin tu dikarî were vira dawa îltîcayê bikî. Ji ber wê, ez hatim Swêdê.

Min diploma xwe ya ewîli li Îngilistanê girt. Lê dûra min master li vir kir û dest bi doktora jî kir.

Heta sala 1975'a ez neçüm nav tu rîxistinan sîyasî. Çunkî ew rewşa ku li Kurdistanâ Iraqê hebû, ci di hêla fikrî, ci di hêla sîyasî de, li gel ku ez ne li dijî wê bûm, xeta wan, fikrî wan û ideolojîya wan ne bi dilê min bû. Ji ber wêya min nikaribû li gel wan bixebeitim. Li gel hevalên rîxistinan Sûriyê min pîr kar dikir, ku cephek an yekîtiyek di nav rîzê wan de peyda bibe. Çend salan (1970-1971) min di gel hevalên Partiya Çep'de kar kir. Min dît ku imkanen wêya tuneye ku yekîtiyek wilo çebibe, min dev ji wan jî berda.

Lê di 1975'an da, gava ku şoreş li Kurdistanâ Iraqê ne-ma û têk çû, bi wî rengê ku em gişt dizanîn, hinek heval li dervayî welat û di hundir welat da, wek hinek guhertînê mezîn hatine pêş, yanê çend fikir hatin meriv wê ci bike? Gerek ji nuha û pê de êdî tevgera gelê Kurd û xebata wî ya şoreşger firsetek tarîxî jê ra peyda bûye, ku bi awakî nû, bi rîbazezî nû, bi xetekî nû kar bike. Mesela ku bila Kurdistanâ be, yan yek perçeyî be ew jî gelekî hate munaqşekirin. wê çaxê ew hevalên ku min dikaribû li gel wan kar bikim Yekîtiya Niştimanî bû. Ez bi xwe yek ji wan kesan bûm ku me Yekîtiya Niştimanî damezrand û roja ewîli da ez bûm endamê Komîta Damezrandina Yekîtiya Niştimanî. Dûra endamê komîta wan a serkirdayetî, heta sala 1986'an. Sala 1986'an min istifa ji nav rîzê wan da. Niha wek insanekî serbixwe ez kar û xebatê dikim.

**Armanc:** Kek Umer, bi qasî ku em dizanîn, tu li Unîversîta Stokholmê li ser Kurdên derveyî welet lêkolînekê dîkî. Gelo ev xebata ji kîjan hewcedariyan derket?

**U. Şêxmûs:** Paş ku ez hatim Swêdê, tu dizanî berê Kurdên ku li derveyî welet hebûn du reng bûn: yan xwendevan bûn, yan karker bûn. Lê piraniya wan jî bi tenê hatibûn. Bi hawakî muwaqet hatibûn û çavê wan li vegerê bû. Zaro û pîrekên (jinê) xwe jî bi xwe re neanîbûn. 2. Hejmara wan kêm bû. Lê pişti sala 1980'î ji her sê parçen Kurdistanâ yên mezîn; Kurdistanâ Tirkiyê, Iraqê û Iranê bi hazaran insan rû li derva kirin û ne bi tenê hatin. Yanî mayîna wan, hatina wan êdî ne bi awakî muwaqat bû.

**Cawa ku Kurd li Rojhilata Navîn li dervayî parantêzê ne, li vir jî ketine dervayî parantêzê, kesî guh nedida wan .**

**Wek xelkê Sûriyê, Tirkiyê, Iran û Iraqê li wan dihat niherîn, yanî ne wek şaxsiyetek taybetî ku gerrek meriv guh bidiyê; mîletekî taybetî, zimanekî taybetî, kultureke taybetî û meriv li ser wî esasî li müşkilîn wan binehêre.**



**U. Şêxmûs:** "Jîyana Kurdan li vir, wek rengekî jî xebata wan a nav welat e." (Foto: Armanc)

temsiliyê da bûn. Ji ber wêya, ji 1962 heta 1965'an min ew kar jî di gel xwendina xwe de kir. Lê di 1966'an da, pişti ku nakokî di nav rîzê Partiyê da li Kurdistanâ Iraqê hatibûn pêş, ci partiya me li Sûriyê, ci min bi xwe, ev rewş û siyaseta hanê rast nedidît. Ji ber wê jî min ji nav rîxistinan Partiyê li dervayî welat istifa xwe da.

Lê wek insanekî serbixwe, ez ji rewşa Partiyê li Sûriyê jî ne razî bûm; ji ber ku gelekî li hev ketibû. Ji ber wiya min wek insanekî serbixwe kar dikir. Lê di sala 1965 an de rewsek wilo hat pêş ku hukûmeta Sûriyê cînsiyeta min kîşandin. Li gel ku ez ne li Sûriyê bûm, hukmekî bi pênc salan li ser min danîn û pasaporta min jî kîşandin. Lê pasaporta min 5 salî bû, nikaribûn ji min bistînim. Min di sala 1962'an de stendibû, heta

Ji ber viya jî jin û zarokên xwe bi xwe re anîn. Yek zêde bûna hejmarê, dudu, guhertîna rengê wan kesen ku hatine dervayî welêt, gelek müşkilat bi xwe re anîye. Gelek müşkilîn ku ne tenê xusîsî ne ji penaberê(mahcirê) Kurdistanâ, belkû ji hemû penaberê dinê re ji. Bi giştî, muhacîrê ku ji bo kar jî têhî her weha di nav da ne. Lê ji bo penaberê siyasî yên Kurd bi temamî hinek müşkilîn xususî hene, ku meriv dikare bahs bike. Gava ku ez hatim Swêdê min dît ku hejmara Kurdistanâ li vir gelekî zêde bûye. Muşkulîn wan êdî gelekî cuda bûne. Me bala xwe dayê ku li ser biyaniyê(xerîb) din, yanî li ser xelkê dinê, biyaniyê ku li Swêdê rûdinê gelek tehqîqat hatine kirin. Min bala xwe dayê ku li ser rewşa Kurdistanâ tu tiştek nehatiye kirin. Yanî, cawa ku Kurd li Rojhilata Navîn li dervayî parantêzê ne, li vir jî ketine dervayî parantêzê, kesî guh nedida wan . Wek xelkê Sûriyê, Tirkiyê, Iran û Iraqê li wan dihat niherîn, yanî ne wek şaxsiyetek taybetî ku ge-

# çar welatan tênen cihê hene"

rek meriv guh bidiyê. miletekî taybetî, zimanekî taybetî, kultureke taybetî û meriv li ser wî esasi li müşkilên wan binehêre. Ji ber viya min dûra dît ku di nav Kurdan bi xwe de, yanî gava ku meriv bi wan re dide û distîne û rûdine, meriv dibîne ku hinek müşkule hene. Hinek müşkule hene ku di wextê xwe de rûbirû nedîbûn. Wek mesela cudabûnê, wek mesela zarakan, wek mesela xwe kuştinê, wek meselê nexweşiyê nefşî, wek gelek müşkulên din yêncivakî ku di nav wan da peyda dibin, ku kesî lênekolaye ku ji bo çi û ji ber ci tê. Dûra meriv dikare çawa çareser bike? Ji ber vêya me qerar da ku em li vir di unîversîte de lêkolînek wisa bikin. Projek hebû ku di xwest bi tenê li wiya mîze bike. Lî li ser wê reforma ku piştî sala 1985'a hatiye, ku penaberan li hemû bajarêñ Swêd belav bike. Hinek armancêñ wan di wê reformê da hebûn. Merkeza me xwest ku li wê reforma binêre. Ji bo çi ev reforma hatiye?

Munaqeşa ku wê çaxê hate kirin ew bû ku gerek em ji dînyê, ji sê perçen coxrafi û ji sê kulturên cûda multecîyan hilbijêren û lêkolînê li ser wan bikin. Ji Ewrûpa Şerqî Polonî, ji ber ku hejmara wan di van salêñ dawî da pir bû. Ji Amerika Latîn, Şîlî. Ji Rohilata Navîn dixwestin ku li gel Îraniyan bikin. Ji ber ku bi hejmar zêde bûn û piştî sala 1985'an hatibûn. Ya sisîyan gelek ji wan siyasi bûn û mumkûn e ku faktorên din jî têda hebûn. Mesela kultura İslâmî, dixwestin bizanibin wê tesîra li ser komel û ciwaka Swêdî ci be? Bi rastî min li vir mesela Kurdan gelekî anî pêş ku divê dêvla Îraniyan, multecîyen Kurd hilbijêrin. Çimkî multecîyen Kurd rewşeke wan a taybetî heye. Ji çar welatên cuda tênen. Meriv dikare bêje ji 5 welatan jî tênen, eger ku meriv Kurden Lubnanê hesap bike. Dudu, vana ji ber ku ji çar welatên, ji çar rewşen cuda tênen.

Ya din, ji ber ku welatê wan tuneye mumkûn e ku projeya wan multecîbûnê ji xelkê din gelekî cudatir be. Çimkî ewen din giş welatê wan heye, dewleta wan heye, pasaporta wan heye, hukûmet bête guhertin imkanên vegera wan heye. Lî ya Kurden mumkûn e ku guhertina hukûmatê jî rê nade wan ku karbin vegezin. Ji ber vêya projeya wan ya hatina dervayî welat li gel ku siyasi ye û çavê wan tim li vegerê ye, ku vegezin, lî mumkûn e guhertina şertan jî rê nede wan ku vegezin welatê xwe. Ji bo viya mumkûn e ku ji multecîyen din zêdetir tevkîz li ser wiya bikin, ku zû bigêñ her welatekî ku tênen, xwe di gel da, wek hevalêñ Soran dibêjin, xwe biguncinîn,

yanê intîbaq bikin. Ev ji alîkî da. Di aliyê din da, ew Kurden ku tênen derveyî welat, di gel ku nîsbetek ji nav wan mumkûn e ku ji bo kar û rewşa ekonomik hatibin, lê piraniya van ji ber meseleyen siyasi hatine. Ji ber viya rewşa wan ji xelkê din bi ferq e. Nîsbetek gelek mezîn di nav multecîyen Kurden da multecîyen siyasi ne. Ji ber viya, jiyanâ wan li vir, wek rengekî ji xebata wan a nav welat e.

Ya din jî, ji ber ku berê tu lêkolîn li ser wan nehatibû kirin, merkeza me qebûlî kir ku em Kurden têxin nav vê lêkolînê. Proje li sê tiştan dinêre:

Yek hatina reformê û parlamento, partiyen siaysî yêñ Swêdê û ew dezgehêñ ku mijûlî vî karî dibin di viya da ci dêwr lîstin e. Yanî ew hewcedariya ku hişt ev reforma bê pêş ci bû, çawa bû?

Ya duduyan; em di nav wan 280

**Mesela kultura İslâmî, dixwestin bizanibin wê tesîra li ser komel û ciwaka Swêdî ci be? Bi rastî min li vir mesela Kurden gelekî anî pêş ku divê dêvla Îraniyan, multecîyen Kurd hilbijêrin. Çimkî multecîyen Kurd rewşeke wan a taybetî heye. Ji çar welatên cuda tênen. Meriv dikare bêje ji 5 welatan jî tênen, eger ku meriv Kurden Lubnanê hesap bike. Vana ji ber ku ji çar welatên, ji çar rewşen cuda tênen.**

komunen (belediyen) ku multecî standine li 6 komunan dinêrin. Ew komunen ku Kurd, Polonî û Şîlî standine, ew aperata standina multecîyan çawa ye? Di heyetê komun da kî dêwr(rol) lîstiye? Rewşa partiyen siyasi di nav komun da çiye, idara standina penaberan ci plan û program danîne ji bo van multecîyan?

Ya heri girîng di projeya me da mherla sisiay ye. Ew jî bi muqayese di gel gelek raporten ku li ser biyaniyan li ser multecîyan tênen nivîsandin. Kêm ji wan, bîr û baweriyen multecîyan bi xwe distînin. Yanî tim ji ser re ji wan tênen behs kirin, lêkolîn tê kirin, lê ji wan jî nayê pirs kirin. Me xwest ji perspektîva multecîyan bi xwe binêhêrin ku dîtina wan li ser wiya çawa ye. Lî tabî, ku mesele bi metodekî ilmî gelek dûr û dirêj e, giş bi hev û din ve girêdaye ye. Em ewil li ma-



**U. Şêxmûs: "Çawa ku Kurd II Rojhilata Navîn II dervayî parantêzene, II vir ji ketine dervayî parantêzê"** (Foto: Armanç)

yina wan ya li welat dinêrin. Rewşa wanî welat, ekonomik, sosyal, di mal da, li bajar, li gund dijiyan. Yanî rewşa wan a giştî sosyal, kultur, xwendin û ekonomî li welat çawa bû. Ya din ew hoy, sebebîn ku ew dehfandin ku bibin multecî ci bûn. Ji ber ku viya tesîrek gelek mezîn li ser rewşa insanekî dike, ku qerarê bide bibe penaber. Ji ber ku viya biryareke ne hêsan e ji bo her insanî. Gaveke gelek mezîn e di jiyanâ insanekî da. Li ser wiya hîpotezeke me heye, ku sebebîn dehfandina insanekî ku bibe multecî tesîrî li ser jiyanâ wî ya li wî welatê têda bûye multecî jî dike. Û li jiyanâ wî ya rojîn pêş jî. Ev li alîkî, ya duduyan, em dinêrin bi rî da, berî ku bigihêñ wî welatê ku wê lê bibin multecî ci bi serê wan da hatîye? Ji roja ku derketine heta ku gîhane wî welatî, ci zahmetî dîtine, ciqasî xwe veşartine, ciqasî zahmetî dîtine ku pasaportê bistîn, yan bi qaçaxî bêne derva? Çûne welatekî din, li wî welatî ciqasî zahmetî dîtîne? Çawa û ciqasî deyndar bûne? Di hêla hissî da, di hêla ekonomî da di gelek hêlan da heta ku karibûne xwe bigîhînîn welatekî. Dûra em li wê dînehêrin, roja ku ketîye wî welatê ku dawa îlticayê kirîye û li vir em behsa Swêdê dikin. Li ser sînor çawa bû, muamela polîs di gel da çawa bû, tehqîqata di gel da çawa bû, dîtîna wî li ser wan pirsîyarêñ polîs ci ne? Ewe jî dîsa hîpotezek me li ser heye. Paş wiya li gora vê reforma nuh, qerar hatibû stendin ku piraniya wan divê biçin qampan. Em giştî, dizanîn jiyan di qampan da, di gel ku qampen vira mumkûn e ku li gor qampen welatê din gelkî cuda bin. Ne çadir in, ne kollektif in, lê dîsa jî rewşenê ne xweş e. İnsan 6 mehan, 7 mehan salekê, sal û nîvekê, du salan di nav qampekê da bê kar dimînin, musaada wan dernakeve, di rewşenê nerehet da ne. Em dixwazin bizanibin mana van multecîyan di van qampan de di wextek wilî da ciqas tesîrî li ser wan dike. İcar, paş ku ji qampen tê komunê, belediyê, li wir êdî em di nav komunan de li wan dinêrin. Ku êdî jiyanekî normal bîrêva dibin. Di vê jiyanâ normal da ,

xwendin, kar, xanî, çûna zarakan mektebê, xwendina wan a zimanê Swêdî, di hêla sosyalê da, di hêla kar da, di hêla wexta vala da em li rewşa wan dinêrin. Me 5 yan 6 demen jiyanâ sosyal hilbijartiye, kar, nexweşî tedawî, lênerîna zarakan û wexta istîrehetê em di nav komunê da lê dinêrin. Em dixwazin bizanîn ku multecî çend sal jê re divê heta ku karibe awakî normal jiyanâ xwe bi rîva bibe û têkeve nav vê civaka vira.

Lê malesef ji ber ku ew hukûmeten hakim in, milleten bîyanî ne, wexta ku behsa ilmî tê kirin, bi awakî baş nayê kirin, yan armanceke wanî taybetî têde heye... Tecrûba xelkê me û meselîn ilmî û lêkolînê ilmî bi vî awayî kêm in. Ez nabêjim tuneye, lê kêm in. Me hinek zahmetî dît. Lî baş çû. Ez hêvidar im ku wê netîcak gelekî baş bide.

Proja me gerek di Temûza 1989'an da xelas bibe. Li ser van meselan 6 kitêb wê bîn belav kirin. Lî ez dixwazim du meselan gelek jî ronî û eşkere bîkim. 1) Di wan kitêban da navê tu kesî nayê nivîsin, yanî ew interwîyên ku tênkirin tenê li cem min dimînin. Tişte ku hatîye gotin bi giştî, dibe parçek ji analîzîn ku tê belavkirin.

2) Proja me di nav unîversîte da projek ilmî û serbixwe ye. Tu girêdana wê bi dewleta Swêdê ra tune . Ne li ser daxwaza hukûmetê bûye û ne jî ji bo hukûmetê çê bûye. Tenê behseke ilmî ye di nav Uniwersîta Stockholmê da.

**Armanc: Baş e, çend kes II ser vê projê dixeblîn û karîyerê wan çine?**

**U. Şêxmûs:** Di sentrûma me da 12 kes kar dîkin. Hukûmetê qarar daye ku profesorekî me wê çê bibe. Serokê wê doçentek e, navê wî Tomas Hammar e. Ku çende salan li ser meseleyen biyâniyan kar kirîye. 4 doçenten din hene. Hinek ji wan sosyal antrepolog in, hinek ji wan sosyal psîkolog in. Çend kesek ji wan ilmî sîyasî xilas kirine. Ji Kurden ez tenê dixeblit.

(Dom dîke)

# Çîrok

Eyd, hêdî, hêdî dihat. Bi dengê çivîkên ser diwaran re dihat. Dihat û li quncikê oda me ya xemgîn vediniş. Me, ji mezinan geleki zûtir bîhna eydê digirt. Wekî ku hewa hîn bêtir dilrehm dibû. Aşûra, bi xwe re qaşikê pîrteqalan dianî. Qaşikê hinaran dianî. Qeşa rexên wê diheliya. Zîbl û zebal ji bin berfê derdiket û li her du rexên wî pisik digeriyan, naw-naw dikirin, kezeba meriv dişewitandin.

Êdî soba dibistanê pê nedixitin. Di kuçan de berf tunebû. Herî û celb bû. Ji dêlî berfê baran dihat. Em sil dibûn lê me ne sar bû.

Eyd dihat û li qoziyê dîwaran û li hêşinayyê nûzîdayî datanî. Eyd dihat û xebera hatina xwe bi keldûmana ku ji diwaranî şil radibû, dida me.

Pêşiyê, me bawer nedikir ku eyd tê. Lîbelê rojekê, gava ku spêde em hatin hewşê û me xwest wek hergav li ser berfa hewzê xwe bişemîtinin, ji nişka ve em lê dabûn. Me dizanî êdî eyd hatiye û berfa hewza ku me heta navikê dikşîne nav xwe û me dixapîne, di binî re helandiye.

Bi halê şilbûna heta navika xwe, em diçûn odê û bi tirs û lerz di pişt perdê re me xwe nîşanê Dayê dida da ku halê me bibîne.

Ji serma û tirsê em dilerizîn. Tirsa me ji wê bû ku nebe nebe Bavo fahm bike û ev dayika belengaz bû ku şalê me diguherand û di berêvkê de jî ranen me diquncirand û li serê xwe dixist.

Em dilerizîn. Ji ber deren xwe yên êşandî û reş û şînbûyi em diketin heyret û dehşetî û me qijîn û nalîna xwe di sîngâ xwe de ditepîsand. Dayê bi xwe jî bi wê eziyet û jana di me derbûyi, dişîya û ser û ruyê xwe dipencirand.

Lê çibûna jî nebe nebe Bavo fahm bikira. Ku em bişewitiyana, ku em biketana û cîkî me bişikiya yan jî me tiştekî winda bikira nebe nebe Bavo fahm bikira. Ev xemxwara dayîmî Dayê bû ku bi gotina wê her qehr û qotikê dadiqurtand û di hundîre xwe de ditepîsand.

Ü eyd bi vî awayî dihat.

Dayê ji bo me heryekî mistek genim û nîsk ji bo şîlkirinê dixist uskurekê, paşê li ser sêniyekê radixist ku zîl bide. Her roj me lê dînihêrt û guhdariya dengê hilma genim û nîskan dikir.

- Pis... fis... pis...s

Bi şevan, Dayê dest bi pînekirinê dikir û ji Bavo re digot:

- Wek ku 'erd eşkere hilma xwe bide, hii!

Bavo, wek yekî ku ava sar bi serê wî de bûbe, bi qelûna xwe cena xwe dixurand û digot:

- Ha. Ee, e kişandiye.

Ü em hemû bêdeng diman. Bêdengiyek wiyo ku me dengê nîskan dibîhist.

- Pis... fis...pis...s...

Her şev me qumberen xwe dibir ber guhê xwe û dihejand, deng ji wan derdixist. Me dixwest ji pişt dîwaran xilikin ên qumbaran, li hundîre wan binihêrin. Me ji xwe bi xwe re digot:

- Bira çiqas buye! Hema hema tije buye!

Peren qumbera herkesi ne ku yê wî bûn. Salê carekê divê ji bo yekî kinc bihata kirîn, ji bo kesê ku kincen wî ji yên hemuyan bêtir pînekirî bûn.

Bi şev, di binê kursiyê de, li ser kirîna kincan em bi hev diketin.

Kurepista Ekber dihat bîhistin ku digot:

- Ez dibêm Esxer, îsal ê min e ha! Birê mi...

Ü Esxer pişek bi lavayî digot:

- Ma par ê te bû birê min, qey naye bîra te? Îsal ê min e, dixwazî em pînen xwe bijîmerin.

# Biyo

## 'Elî Eşref Dervîşyan

Paşê, Ekber û Esxer dest pê dikirin dij-martin. Bi pirrbûna pînen xwe Esxer qezenc dikir lê dîsa jî pitepit û kurepista wan dihat bîhistin.

- Pist...pist...par...pist...pist...

- Wiş... pîne..wiş...

Dawiyê, ji nişka ve kursî pêt dihejiya û dengê xîrfîn û ufîna yekî ku dest li qirika wî hatibe şîdandin, dihat. Dayê diqîriya:

- Ya Hezretî Ebbas, hevdû xeniqandin!

Bavo hema kulmek li lihîfa alî Ekber û Esxer dida û kurepistê dida birrîn.

\* \* \*

Rojekê em li dora hev runiştin. Me qum-bere anîn. Dayê jî ya xwe anî. Çar qumbere bûn. Dayê bi tevşo şîkandin, çend caran perê wan hejmartin, paşê bi şik li min ni-hêrt. Peren min ji yên hemuyan kêmter bûn. Ez hînî riya pere ji qumbere derxistinê bûbûm.

Sayî ket nav me. Ew xemgîniya daâmî ya ku wek tayekî reş misêwa li ser lîvîn Dayê bû, êdî nemabû. Dayê pere xist guçê çarşeva xwe û em bi hev re çûn çarşiyê.

Ca'de ci xweş bû! Dîkanênu ku kuliçe di-pahtin... Ci bîhnênu xweş! Kulicen rûnê nîvîşk. Rengo-rengo ava meywan, tîrş û şîrîn, benîst. Min di dilê xwe de digot:

- Eger ez mezin bibim, bi Xwedê ez dê perê xwe gişî bidim bi kuliçen rûnê nîvîşk.

Min ji Ekber re got:

- Ku tu mezin bibî tu peren xwe ci dikî?

- Didim bi tîrş û şîrîn. Qesem bi navê Îmam Riza, her şev ez diçim sînemê. Her şev...

Ava ku bi devê wî ketibû daqurtand û pê re gezek li perçê nanê ku bi xwe re anîbû xist, ji min pîrsî:

- Bira em kengî mezin dibin?

Min got:

- Divê meriv pirr bixwe ku zû mezin bibe.

Ekber bi bêhîvî got:

- Ku wiha be, em tu car mezin nabin. Ay dayê, ay!

\* \* \*

Em gîhaştibûn dikana çakêt û pantolan. Dayê bi dikandar re qise kir û Esxer nîşanî wî da.

Dikandar wisa bi dîqqet li Esxer dînihêrt, te digot qey heywanek kovî dîtiye. Pişti lînhertina bi dîqqet, ji alîkî dikanê şivek kişand û pê ji qatiyayê dikanê qatek çakêt û pantolê piçûk danî xwarê.

Esxer bi alîkariya Dayê çakêt û pantol li xwe kir û du-sê kulmik jî ji dayê xwar. Gava ku qomçen wî qefaltin, wek ku Ekber dest di qiriqê xe bişidîne, xirexir jê hat.

Dayê berê xwe da dikandar, got:

- Birawo, ev pirr teng e û ne xweşik e jî. Yekî din bîne. Niha wê zarokê min bixe-niqfîne.

Dikandar dîsa bi serê şiva xwe kinc li qatiyâ daleqand, ji alîkî de jî çilmika xwe bi milê xwe paqîj kir û ji qatiya bedlek kincê din anî.

Rengê vî çaket û pantol ne xweş bû. Xuya bû Esxer nedixwest em wan jê re bîkîn. Gava ku Dayê çakêt lê kir, wî destê xwe di mil re nekir, girmilekî xwe pirr

zêde bilind kir. Her ku dayê bi zorê girmil-kê wî nîzim dikir, Esxer dîsa bilind dikir. Du-sê kulmik ji Dayê xwar. Dayê bi hişkî li girmilkê wî yê bilind dixist, her du alî dibûn yek lê dîsa wek berê yek jê bilind dibû. Esxer zikê xwe dinepixand da ku qomçe neyên girtin, hîn qomça wî ya dawî negirtibûn ku xirexir jê dihat.

Li ser daxwaza Dayê vî bedlî guhartin. Min û Ekber me di bin çavan re li dikanê dînihêrt. Ci çakêt û pantolên xweşik! Li gor min, li gor Ekber. Jinê din jî ji bo kirîna kîncan, bi zarokan xwe re hatibûn.

Ji nişka ve qîjîn bi Ekber ket. Qîjînek wiha ku wek bişewite yan dûpişkê pê ve dabe. Herkes nerhet bû. Destê dikandar le-rizîn û ji jor de çakêtek bi ser serê wî de ket. Bi tîrş em ber bi Ekber çûn. Hat fahmkirin ku ji zarokan yekî keys dîtiye û gezek li nanê destê Ekber xistiye. Me got qey destê wî gez kiriye lê na, gez tenê li nan xistibû.

Lawik, bi halê xwe yê ricifokî û reng lînemayî sekînîbû û bi zorê nan dicût. Diya wî hema bi hîrs şîlmaqek lê xist, ruyê wî yê zer kir wek gulek sor û dû re ra-kir û li erdê xist, şalê wi şeqitand û bi diran rana wiya spî ya bêxwîn gez kir. Dayê bi hîrs bi ser jînikê de qîriya:

- Cîma tu li kurik dîxî diya min, ma ku-fur bû, ci kir? 'Eyb tê de tune!

Dû re berê xwe da Ekberê ku ji vê sahnê tîrsiyabû û bi xişim got:

- Tuşî li te be! Hey nankor! Ci ciriya! Goşînanê te xwar?

Jînik bi ser kurê xwe de qîriya:

- Hey parsekê birç! Ez dê hûrê te bela kim! Ma êvarê wê bavê te neyê malê? Ez dê te teslimî wî kim, bira şîşa sor di zîke te ra ke!

Pariya nanê ku di xweziya wî geriyabû, di bin piyan de pelçiqibû.

Qîr-wîr qediya û li ser daxwaza Dayê dîsa çakêt û pantolek ji jor hat danîn. Li gor dilê me bû. Em vegeyîyan malê.

\* \* \*

Me çakêt û pantol li dîwarê oda xwe daleqand. Esxer, serê seetê carekê diçû sindoqa me ya piçûk dianî, datanî bin lingên xwe û bêrîkên çakêtê xwe dipeland. Heta bi şev gava ku em hemû di xew de bûn, wî dev ji çakêt û pantolê xwe berneda. Di bêrîkex kwe de kaxezek ku li ser "36" nîvîsandî bû, dîtibû. Ekber vê kaxezê jê dîzî û çend roj her li ser wê pev diçûn.

Esxer digot qey ew kaxez divê her pê re be. Perçekaxezekê din peyda kiribû, li ser "32" nîvîsandibû û xistibû hundurê bêrîka xwe. Lê ev ji ya din ne xweşiktir bû û Esxer timî li mahna digeriya û ji Ekber şîlmaq dixwar. Sed carî zêdetir bêrîkên xwe pelandin.

\* \* \*

Şeva eydê, bi bîhna birinca şusî, bi bîhna xwêdana canê keçikan re dihat. Di wan şevan de dengê axînê dihat. Dengê axînê wek darek şîkokê ya mala cîranan bû ku her dibîşkîvî. Dengê axînê wek çiyayê Pirrawî be ku berfa wî heliya be û bûbe av û dengê axînê wek ku Dayê be.

Dengê babet babet patpatikan û fişekîn

hewayî yên ku rengareng şewq didan, şeva bajêr tevlihev kiribû.

Şeva eydê, ji bo min pirr dilşikên bû.

Em li quncikekî odê rûdiniştin. Bavo cixare li ser cixarê dîkişand. Dayê ji ber karê rojê westiyâbî bû, vir de wir de hildipekiya û birincineqand.

Bavo li me nedînîhêrt. Serî di ber de bû. Timî paltoyê xwe diavêt ser milê xwe û di quncika odê de çarmîrkî rûdiniştin. Diponijî. Li derva fişekîn hewayî, li tariya esmîn xêz dîkişand. Dengê qîr-wîr zarokan bilind dibû. Min û Ekber û Esxer, me hêdî hêdî û bi dîzî xwe dîkişand piş cama pencera odê. Me bîhna xwe di hundîre xwe de digirt û zoq li derva dînihêrt. Me xwe ji bîr dikir. Bi fişekîn hewayî re serê me jî ber bi esmîn bilind dibû, wek ku em bixwe wan biavêjin. Min digot:

- Ew, ewa bi stêrk a min bû.

Ekber bi kîf digot:

- Ewa han jî a min.

Ü Esxer xwedî li fuzyek bêstêrk derdi-ke. Me li ser wan şert digirt ka kîjan bîstêrk in, kîjan bîstêrk. Şertgirtin bere bere pêş de diçû. Bîhna me ya ku me di hudîre xwe de hefs kiribû, derdiket û nişka ve Bavo diqîriya, em ditîrsandin, dixwest ku em ji pencerê dûr kevin.

Em bi lez vedikisiyan ciyê xwe. Bi dengê fişekîn hewayî ku ji ser riyan dûr yan nêz dihatin û li malan û kuçan diteqîyan, em kîfxwes dibûn.

\* \* \*

Eyd bû. Hingî me xwar, zikê me eşîya û me lêdan jî xwar. Me qumberen nû kirîn û em li benda sala ku tê sekînî, me digot hela ka dora kîye.

Hingî hustukura çakêtê Esxer hişk bû, dora stûyê wî sor bûbû.

Tafîl pirr zû diqedîya. Em li binê bîrîken xwe digeriyan, me fîrdîkên kulîncan ku tevî mû û gemarî bûbûn, derdixist û bi hesret dixwar. Dayê ji Esxer re hustukur dirût û stuyê wî ji birînbûnê xelas kir.

Em di şevê dawî yên eydê de rûdiniştin, me zû-zû dersen xwe çedîkirin, em digirîyan. Girî ji bo rojîn ji destê me çuyî, ji bo şerînayîyîn ku êdî tunebûn, ji bo te'îla derbasbuji û ji bo dersen nînîvîsandin.

\* \* \*

Ji nû ve çûna dibistanê dest pê kir. Kursî êdî ne di nav odê de bû. Wekî ku em tiştekî winda bikin. Bavê min êvaran di quncikeke odê de rûdinişt û şîrîn Baba Tahirî Uryan dixwend.

Çend roj bû ku Esxer xwe ji me vedîart. Bi dîzî dihat-diçû, bi kesî re pev nedîçû, he-nek nedîkir. Wek alîkî wî felc bûbû, kitêba xwe ji kîlekekê digirt û dihat malê. Kesî nîzînîbû çakêtê xwe datîne ku. Mirûzê wî tîrş, ew bi xwe xemgîn bûbû, reng lê nemabû. Bi me re kêmter qise dikir. Du-sê caran dayê gotibû bira ç

helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest hel

## Şârekî Kurd

## Ebdilrehman Mizûri

Ebdilrehman Mizûri sala 1948'an li gundeki dorhela Dihokê ji diyâ xwe bûye. Ew li Kurdistana Başûr dî nav şairên çerxa me de şair û niviskareki gelek bi nav û deng e. Wi, li Universita Bexdayê beşê coxrafayayê xwendiyê.

E. Mizûri hin ji biçukatiya xwe bi edebiyat û zimanê Kurdi mijûl bûye. Gelek nivisar û lêkolinên wî, yê li ser edebiyat û nemaze li ser helbesta klasik a Kurdi, bi zimanê Kurdi û Erebi di rojname û kovaren Kurdi û Erebi de çap bûne.

Kîtebeke helbestan a E. Mizûri bi navê "Jî Evîna Çirayêñ Kevin" çap bûye. Ew helbesten xwe bi teşênuh dînivise; dî helbesten xwe de bûyer û çirokên folklorik bi hawayekî hostatî bi kar tîne. Helbesten wî li herêma Behdinan gelek belav bûne û pîrraniya xortan wîn ji ber dizanîn.

E. Mizûri nuha li bajare Dihokê mamostetîye dîke. Em li jer sê şîrîn vî helbestvanê Kurd pêskesi xwendevanen Armancê dîkin.

## ÇEND WÊNEYÊN SAVA

Ronahiyê carekê gote tariyê.  
Were bo te çavêñ gêş,  
têr binêre l'bêjnêñ keleş  
Tarî tirsinok e, revî  
Weke qolêñ çekçekilan, kete şkefta  
û dar û devî

Min wê gavê zanî eger;  
Zilek bi tinê xwe b'sojitin, bo rastiyê  
Milletek dê pê bit xenî  
Tarî dê j'ber mişext bitin  
Û êdi nakit repînê.

Mêwa tirî, carekê gote stirî;  
Ger tu nanê jaran nebî  
Fêkiyê rebaran nebî  
Sibera şengebêriyêñ waran nebî,  
Meya lêvîn hevrê û dildaran nebî.  
Baran nebî,  
Baştir ew e, her tu nemînî  
Û tu nebî, her tu nebî.

Spêdeyekê rûbarî gote aqarı  
Piştîşim, natebitim,  
Hevsarê çûkan dikêşim.  
ewrêñ esmanî d'givêşim  
Da baran bêt û av bidim  
Zevî û axa  
Da şîn bikim hîvî û daxa  
Tu çi nakey  
Lewa her pûş û pelexî  
Bo som û solêñ biyaniya  
her kelex î.

Ciwankevoka carekê gote çeqûka  
Bo we şerm e û fêhêtî ye,  
Hemî Gava bîsta we l'ser me ketîye  
Ya çûyi çû, ji evro pê ve  
Yê ava gundi şêlî ket, yan zêlî kit  
Wekî kelem û dasiya bi dûv êlê kit  
Ger diwêrin, herin navê wî veşerin,  
Yan bes hûn bo ciwankevoka xurt û  
mêr in, xurt û mîr in.

## Xanî

Memo! Memo!  
Esman bi moran û temo  
Rabe tu tîrsa mîr neke  
Birhatina reşçavêñ Zinê ji bir neke  
Perda te bo zavayînîye çandî û vedayî:  
Evroke kal û pîr neke.  
Rabe Memo! Tîr û kevanêñ xwe rake  
Tev daristan û kizîn me, ji tarî û hova  
Vavêre, mist çîra ke  
Zin ya ixsîr û bende ye  
Bejna wê ya şîrîn û şeng  
Weki takê rihanokê  
Di ber textê singê xwe re ke  
Di ber textê singê xwe re ke

## Cizîrî

Selma! Selma!  
Rast e, fîraqa min û te  
Çirokeka gelek dirêj û bê bin e.  
Germîya çav û peyvîn te  
Jî mîj were ne ya diyare û ya win e.  
Bila, hila û bira min î.  
Dava ter a bîlûr û tembûra min î  
Ez û tu wek ava derya û rûbaran  
Dê gîhîn êk û bo min î.  
Ne bêje Sofî bo eşqê ci bê jivan  
û bê soz in,  
Tev pelatink û perwane ji me fîr bûne  
Di guriya çavêñ king û şeng ên zerîya de  
xwe bisojin, xwe bisojin

## JI EVÎNA

## ÇIRAYÊN KEVIN

## Teyran

Hey av û av  
Hey av û av  
Te dil teji raz û sir e.  
Teji ger dav rast te hene  
Dî berperen çerxê bistî de  
Bo naneka sotî û xav  
Xwe bikin tajî bo xelkê  
Bikin pêlav

## Herîrî

Perîxanê! Perîxanê!  
Şîir neman, min bo çavêñ te neristin  
Agir neman, sexmerat gesiya rûyê te  
ne perestim.  
Jinişkê ve sibera te l'me wergerîya.  
Lewa perîşan û pest ïn.  
Perîxanê bîzivire ve  
Maziçinêñ mazika me l'hîviya te ne,  
Mel û kîvânêñ zevika me l'benda te ne  
Bîzivire, melokêñ me bike genim  
Xwezikêñ me bike baran, bike şewnem  
Da e' ji yar  
e' bejna te ya şîrîn û xav têr bikenim,  
têr bikenim.

## EGER EZ

Eger ez koçerek bama  
û gotbane min: Kewalêñ xwe bibe, beheşte, biçêrîne.  
Beheşt cihê giyayê şîn e.  
Da bêjim ne.  
Berê pezî dê dim, zozan û kêriya  
Warê nefel û tevrîya  
Bo nav govend û şergeha şengetîya  
Da nebêjin ci warekî bê xudan e,  
Xudanêñ wî ji xwe nagrin, bo xwe bikin  
Hewşî û koz û çerwane.  
Eger ez çûcîk bama û gotbane min  
Here hêlinêkê dane.  
Her da zivirim, li giş qulaçêñ dinê çewirim  
Dûmahiya darmaziyeka serbilind a  
betenokêt te welato; bo hêlinê,  
bo tozgevizka vê jînê hilbijêrim, da hilbijêrim  
Eger ez nêrgizek bama û gotbane min  
Here binve d'qafkekê de û  
Xwe bihejîne û vira dane, di nav  
dûwan û kûçkekê de.  
Da bêjim ne  
Mala min j'wê derê bar kin,  
Bejna min a şeng û zirav  
Di ber toq û biska bêriya vî gundi re xwîl û xwar kin.  
Ger şivan hat, da bileyizit j'keyfa de  
Eve sed cara xweşîr e.  
Ji dîtina tilgeniyêñ, di nav text û telar û kûçka de.  
Eger ez şairek bama û gotbane min;  
Here hozanekî birêse, bistire mîna bilêse  
Da ez ci kim  
Da qebqeba kewa berdim,  
Derewêñ darkoka birim,  
Wekî bazirganê dilsoj, gula kirim  
Serevraz, berew jêhî bo gopîka jêhafî ya rastiyê firim  
Eve ye ristka hozana  
Eve ye tîra kevana.  
Da bizanî, bo hetavê, bo ewa bûka çiravê  
Çîtov dildarekî cir im, çendî cir im.  
Eger ez rûbarek bama û gotbane min  
Ka navê xwe j'me re bîne, ka hewîya xwe  
j'me re bixwîne.  
Da bêjim; Ez  
Rûbarekî xudan pêl im,  
Qira ku ava min bidizit, bo nahêlim  
Tu bizane; her hîvîyeka xelkî firot,  
Her Memo yê d'gel Zîna xwe nebûye cot  
Her Hisêne d'Kerbela de av negîhîştiyê vexwit  
Her bîrsiyê l'qoçalîyê tibla d'mejit nav mişot  
Her sêwiya l'qesra axayî neşet kaşa û cilka bişût.  
Lê kenarêñ xwe ez av didim

Bo maçikirina rojeka pirr ron û ges,  
Ez pal didim, ez pal didim.  
Eger ez derwêsek bama û gotbane min  
Wekî teyîrê mest û serxweş ê nav refê  
Hilo, hilavêje defê.  
Da bêjim ne;  
Me jî veda ew berperê qîş û kefê  
Ezê rabim, lawikekî nû j'we re xwînim  
Keziyêñ Xecoka Silîvî ji dil vehînim  
Tembûra Feqiyê Teyran bo pizoka  
Bo bîtanok û kevoka çak şarinim,  
Wekî xurta, ava vî gundi serevraz  
Bo serekanyê zivirînim.  
Zevîka ade kim, şe kim  
Tev dergehêñ dayêxistû  
Bo xatûn tîroşkê vekim  
Ew landika nav daye min  
Ew dara sîtav daye min  
Ew kaniya av daye min  
Dar û bera tê wer nakim, tê wer nakim  
Eger ez kaşoyek bama û gotbane min  
Bo ci te pişt ya çemiya ye û xwaro ve  
Pişta xwe rast ke, hilo ve  
Da bêjim ez  
Bo ci xemêñ pîrteqalêñ cinîka Mehmûd Derwêşî  
Bûne gulwaz û tilove.  
Bo ci werzê XANî ji dil perjan kirî  
Herî bê dan û bê tov e.  
Ew buhara NERÜDA yî pal daye nav, xirt û şov e.  
Xanima dîlbera LORÇAY j'nav defterka şîrîn wî  
rabû û çû ve  
Lewra pişta min a qûf e û rast ve nakim  
Yan dê mirim, yan lîsekê bo dîkilêñ sibehê  
dê ava kim, dê ava kim.  
Eger ez şahînek bama û gotbane min  
Lo şahîno, xemkomkero, xemcemîno  
Çîma dengê te nayêtin  
Takê ku te dadeye ser, na bilind bît û d'hejîyit  
Da bêjim ez  
Teva barana dengê min çok nebûye û her dê hêtin  
Ji mîje bapîrê min gotû: "Cûka av lê çûyi carek,  
de her lê çit û dê zêtîn"  
Evîna cama dilê me mişt kirî ne xwar dibe û ne tê rêtin.  
Ew mîhrîbana Berwari hindî şev ya dirêj bitin  
Sipêde meşka xwe dê kêtin  
Ne bêje min mîw êdî nadite tirî  
Ne bêje min baz yê ji hêlinê firî  
Ne bêje min Derwêşê Ebdî yê mirî  
Êdî şepala Edlayê narevitin  
Ne bêje min. Ne bêje min.

# Tucar û Xancî<sup>(1)</sup>

Arêkerdox: Oskar Mann

Yo tucar bi. Rocêk wurişt we, bazırganî xu girot, şî yo şaristani d' na ro. Şî yo qahwe(qehwe). **Onîya** verî qahwê di yo hawz esta. Çend tucarı ser nişti ro. Wi zî şî **nişt ro**. Onîya zerey awk ra, yo sûret tede dî. Ay tucaran a persa:

- Ina çi suret a?

Tucaran va:

- Ina keynay yo paşay a. Qonaxî yay qahwî ser o. Roc di sa'etî yenna verî pencera, nişenna ro, sûreti yay dano awk. Ma pérû zerî koti yay. Ma gurey xu qay yay a terk kerd. Malî ma pérû qay yay a şî. Ma nêşkay buwazim (biwazim).

Ay tucarı va:

- Mi rî **buwazen**.

**Inîn** va:

- Mali tu zaf esto?

Va:

- Pancas hanzar malî mi esto.

Şî, paşay ra waşt. Paşay da ci. Mali yi pér tira gurot (girot). Çend serî úca vinert. Rocêk va:

- Ez şinna **wilatê** xu.

Vistorê yi tira va:

- Meşuve! Mi het vind!

Va:

- Çare çinyo, ez şinna! Vistorê yi çewras (çewres) qatîr mal bar kerd, da ci. **Şawit** wilatî yi. Cinîyê xu û malî xu girot, şî. Di serî vinert, rocêk **cinîyê** xu ra va:

- Ez o şinna tucarey.

Cinîyê yi va:

- Şuwe!

Wurişt, malî xu qatîr bar kerd, şî. Resay yo şaristan, malî xu berd xan d' na ro. **Ewnîya** xancî ame het, va:

- Merheba! Ça ra yennî axa?

Va:

- Ez ama tucarey.

**Sand** bi. Tucarı amey pê ser. Inî tucarı jû (yo?) dis mali cinî yi day bi ci. Vistibî xu cieb. Cinî yi kot vîri, dismal vet, ewnîya tira. Yo ax ant, vist xu cieb.

Xancî va:

- Ina dismalê dostê min a. Tu ça ra arda?

Yi xancî ra va:

- Teres! Dismalê cinî min a!

Xancî va:

- Ez (û) ti ma şart(şert) kennî. Ez şinna keyî tu. Eger mi yo nişanê cinîyê tu ard, ti inî malî xu bidi mi! Cinîyê tu xu ra dostê min a. Mi g' niard ez inî xanî xu piya malî ya dano tu.

Ard ana şart kerd. Xancî

wurişt şî **kiye**. Şî verî berî, ber kuwa. Beslima amey pey berî. Des altunî day ci, şî. Roc (roj) bîn **hancî** ame, ber **kuwa**. Beslima amey pey berî. Vist altun vet, da ci. Beslima va:

- Ti kam i?

Va hal-keyfiyet mi ana wo.

Beslima va:

- Ti vanî se?

Yi va:

- **Paçey** (paçî) Xanim ra yo parce **tira biki**, mi rî **biya**! Çewras altun dana tu!

Beslima şî zere. paçey Xanim ra yo felqe kerd, ard da yi. Girot û şî. Şî mîrdey Xanim het. **Aw** felqe **mot cl**. Tucar ewnîya tira; raşt a. Xancî malî yi pérû tira girot. Xizmekarî xu **şawiti** kiye, va:

- **Şorën** keyî **babî** mi! Mi rî hîris (û) now xizmekaran **bışaw**!

Xizmekarî şî keyî babî yay, va:

- Keynay(kênay) tu hîris (û) now xizmekarî tu ra wa zenna.

Day ci, **yin** girotî amey. Xanim wurişt, **kincî** camêrdan girotî pira. Hîris û no xizmekarî girotî, şî xanî ay xancî. Xancî şand ame het, va:

- Axa bê ma xomar bî kim!

Xanim va:

- Yo şartî min û tu esto.

Ma şart **bikim badî co** ma xomar bikim!

Xancî va:

- Wa bo!

Xanim va:

- Ma reqî **bûrim**! Kam hê verî bi serxoş, **awi** malî xu bido ay bîni!

Şawit reqî ard. Xanim xizmekar ra va:

- **Şuşo** yo **dek'** bidi yi, şuşo yo bidi mi!

Xizmekarî **kerd de**, da ci.

Xancî bi serxoş, kot. Xanim timanî xancî vetî, morê xu kerd sur, na paştî ya. **Wurişt we**. Xancî va:

- Kam hê verî serxoş bi?

Xizmekarî va:

- Axay mi hê verî serxoş bi.

Xancî va:

- Mali tu ez gienna.

Xanim va:

- Ez **qawul** nêkenna! Ti

pira. Xizmekar ra va:

- Venda axay xu bidi, wa bêro cuwar (cor)!

Xizmetkarî ven da, ame cuwar(cor), va:

- Ti qey mi ra hêrs bi.

Va:

- Ti zana tu ci gurey kerdî.

Va:

- Mi gurey nêkerdi.

Va:

- Qahwecî (Xancî) dostî tu yo.

Va:

- Venda ci di!

Venda ci da. Qahwecî ame. Xanim va:

- Xancî, raşt vac! Tu felqey paçê mi **ça ra** berd?

Xancî va:

- Ez ameya pey berî şima, mi ber kuwa. Beslima amey

teber. Mi **çewras** altın da ci. Amey, felqey paçey tu tira kerd, ard da mi; mi zî berd **mot** mîrdey tu. Mali yi mi ci ra girot. Mi botan tu kerd.

Xanimi mîrdey xu ra va:

- Ini Xancî ber ciyer (cîr)! Beslima z' ber het! **Hur dî** piya **sera** (sare) bibirn!

Xancî berd ciyer, beslima z' berd het. **Hur dî** sera birnay(2).

(1)Namey na hikaya (Tucar û Xancî), ma pa na.

(2)Bewnî: Karl Hadank-Oskar Mann, Mundarten der Zaza Hauptsaichlich Aus Siwerek und Kor, Berlin, 1932, r: 327-330.

## ŞALAGI

Keyew vilakewte  
binê potînan di.

Cenîya vêkanaya zacilana viyay  
mîrde, nê perraye koyan ra

nê pey beran di  
berpa û pepük,

nê pey hewt koyan û hewt royan di.

Ha laj, ha keyna

zar û zêc,

çimziçin û enušk û veysan

him warbay, him virran

pergende wû nezan

mendê miyanê tencan û siloyan di

zey sêkurran.

Gege şonê mekteb,

maya şima bimiro leyro,

pîy yînî zî şînî esker!

"Ne mutlu...ne mutlu...." vanê

"Varlığım varlığına armağan"

bêvind, tarî ra tarî.

"Varlığım varlığına armağan"

ey mîlîtanço çaretokerde!

Hey gidî dey!

La gurey şarî!..

Hezeki vanê,

tay wenîştê na dinya,

bara ma wegîrotîş.

Bi çarebê şima, bi namê Hûmay!

Mîrdim hêrsan ver xint bo zî

lal û tat

û kerr û gêj bo zî

kijj!

Dişmen kesî rê nêdejeno.

Wardoxê para to,

werey nêgeyreno to rê.

'Elem eşkara

wegîrotîş û ronayîşê şalagi ma dest o

ma nêronay, ma...

qey ma nêronay?

Raşa ma vanîm,

hêvî gelan ra nêbiriyêna.

Belê.

Ki ena w

nik û newe ra bewnê dor û dormar

û der û cîranan!

Hêvî nê biriyêna

çimê yê wardo,

zanî şarî heme şalagê xo ronay!

Malmîsanij

## Ji xwendevanan

Ji bo komîta  
berpirsyarê  
Armancê


Hevalen hêja, derxistina kovara Armancê ku hûn bî zimanê Kurdî dînîvisin, ji bona gelê Kurd pîr giring e û divê ku her yekî Kurd ji bona derxistina Armancê ci ji destâ bê jê re piştgiriyê bîke.

Heta vêga ci hejmarên Armancê yêng derketine min hemû xwendîye; pîr jê razî me. Ez ji wek xortekî Kurd ser xwe wezîfê dîbinim ku ci tiştê ji destê min bê dê alîkariyê bîkim. Û her dem serfiraziya we dixwazim.

Ji we re nuçeya ser wêna(resman) Dara Mihemed rî dikim.

Selîm/Şam

## Xaçepîrs



**ÇEPERAST:** 1- a)Bajarek li Kurdistana İranê ku paytextê Cumhûriyeta Kurdî a 1945'an bû. b)Kal, extiyar. 2- a)Di Kurmanciya jorî de pronavek. b)Ne hêdî, bi lez. c)Çemekî di navbera Kurdistana Tîrkiyê û Yekîtiya Sovyetan de. 3- a)Şerîh kirin, îzah kirin, bi awayekî fi-reh, gotin. b)Peyveke, di cimlîn "gazîkirinê" de bi kar têt (berevajî). 4- a)Di Kurmanciya jorî de daçek (proposition) (berevajî). b)Zeyif, bê hêz, çîlaz. 5- Hazir. 6- a)Navekî qîzan (berevajî). b)Ne tiji, xalî (berevajî). 7- a)Navê teyrekî ye, her weha navê qîzan e (berevajî). b)Ji çiyayê pirr bi asteng re dibêjin, riya teng û xeter. 8- a)Dewarek (berevajî). b)Li deverên çiyê ji kevinîn mezin û bilind re dibêjin, teht. b)Kesê mihtacî avê, têhnî (berevajî). c)Erd, xak, toprax. 9- a)Sembol, remz, işaret. b)Navekî kuran (bereva-

jî). 10- a)Di Kurmanciya jorî de vegetandeka pîrniyê. b)Bi Kurmanciya jêri "ufuk" (ufûq). c)Li Botan û Çolemergê ji "hêt"ê re dibêjin. 11- Ji navekî kevin ê Kurdan. 12- a)Navê rojekê. b)Tişt û mişt, firax, qîr û qaç. c)Eşef, karê çinîna giyayê biyanî ên di nav zeviye genim, ceh, nîsk de şîn dice.

**SEREJÊR:** 1- a)Navê stranbêjeke Kurd a bi nav û deng, b)Pirsiyarek. 2- a)Mêr, egîd, xweragir. b)-

## Bersîva hejmara berê

**Ceperast:** 1-Şerko Bêkes, 2-a)êrîş, b)berberî, 3-a)xemîl, b)dil, 4-a)me, b)pird, 5-a) erê, b)ho, c)ol, d)na, 6-a)hefte, b)avahî, 7-a)giyan, 8-a)Ürê, b)olan, 9-a)dûbe, b)gewr, c)rû, 10-a)şin, b)taş, 11-a)te, b)çiya, c)în, 12-a)ala, b)Bane, c)vîr

**Serejêr:** 1-a)Şêx Mehmûd, b)ta, 2-a)êre, b-)re, c)rûpel, 3-a)rim, b)Berfê, 4-)mişk, 5-a)leheng, b)bîn, 6-a)bî, b)gîya, 7-a)Durê, b)Ayşe Şan, 8-a)ke, b-)rovî, 9-)Ebdila Goran 10-a)pirs, b)şiv, 11-a)le, b)nîhar, 12-a)bo, b)ka, c)nûbar

## Dûmahîkan xeberan

## Cûnta xwedî û berpirsyarê kovara....

Kurdan dike, bîr û raya wan a giştî tîne ziman û li dijî t'eda û zulma ku li milletê Kurd dibe derdekeve.

Ku ev yek nebûya wê ji ber ci her çar hejmarê kovarê bihatana berevkirin, ji ber ci, şirketê ku rojnaman û kovaran belav dîkin wê xwe nedana ber belavkirina kovara Medya Güneşî û ji ber ci, polis wê bi videoyê buroya kovarê kontrol bikira.

Rejim bi wan tedbîran dixwaze ji alî aborî ve kovarê bide sekinandin. Bi cezakirina xwediyê

## Biyok

Gava ku li ser sirê rûdine, xwar rûdine da ku zarokên li cem wî 'aciz nebin.

Wer li min hat ku wek tasek ava sar bi serê min de be. Bi bayê bezê ez çûm malê, min ji Dayê re got:

- Biyok di bêrika Esxer de maye û dernakeve.

Dayê qasekî li min nihêrt. Piştî ku fêm kir ci qewimiye, bi nalîn got:

- Axxx! A nuha biyok di ku re ket bêrika wî biyokxurê kuçikbavî!

Ku min mesele jê re got, Dayê hîn ji hers bû. Hema di wê navê de Esxerê reng lînemayî hat. Kitêba xwe disa dabû ber bêrika xwe, silav da. Dayê got:

- Elêkum selam raymezin, ka were ez bêrika te bibînim.

Esxer ricisi, rengê wî spîtr bû û ji nişka ve dest pê kir giriya. Me çakêtê wî jê kir û danî alîkî odê. Ku dengê me hê derket, cîranê me, bavê Husênen hevalê Esxer ê sinifê, ji jina xwe pîrsî:

- Qîzî ev girîn-zarîna ci ye?

Jinikê bersîva mîrê xwe da, got:

- Hey lo, tu hîn pê nehesiyayî! Biyok di bêrika çakêtê Esxer ê nû de asê buye. Ev hefteyek e! Ma tu li ku yî?

\* \* \*

Şev, gîran, bêhal û birçi, wek bavê min dihat û ode tije dikir. Em bêdeng rûniştibûn. Ji bilî xumîna Aşûra û 'ewtîna kûcikan 1û deng dermediket. Me çakêtê Esxer tevî biyoka ku di bêrikê de danîbû alîkî odê. Gava ku bavê min mesela fam kir, çend cixare li ser hev kîsand. Xeber dan Apê Pîro da ku bê. Apê Pîro û Amojinê hatin. Em bêdeng li dora hev runiştin.

Apê Pîro pîrsî:

- Ci buye, xêr e?

Dayê bi bêsi'ûdiya xwe got:

- Xêra ci, halê ci. Ev hefteyek e ku bi biyokek gir di bêrika çakêtê Esxerê beredayî de maye.

Apê Pîro, li çakêtê ku bêrika wî wek rişek mezin werimî bû, nihêrt û bi hêrs ji Esxer re got:

- Xwezi biyok di rêviyê te de asê bibûna, em ji te pak bibûna.

Û dest pê kir "rîş"ê peland.

Min û Ekber, ava ku bi ser devê me ketibû me daqurtand. Esxer di quncikekê de sekinibû û diricîf. Dayê berê xwe da wî û got:

- Nuha hestiyê kulimeka te ji şî-kandiye. Cîma tu rûnanî? Belqitiyo!

Esxer li alîkî rûnişt û xwe bi ser hev de melisand.

Bavo, piçek bi çakêt biliya û bi bêhêvî ji Apê Pîro re got:

- Nuhâ wê çawa be? Ne xweş e ku her roj bi vê "rîş" a xwe here mektebê. Di nav xelkê de ne baş e.

Dayê bi qehr got:

- Dev jê berdin bira heta dawîya salê bî halî here dibistanê da ku tobe bike.

Amojinê berê xwe da Esxer got:

- Kuro tu qasî kerekî yî! Ma ci karê te bi biyokê hebû, hey zikê te bigeliş, kezeba

kovarê rejima diktator dixwaze kesen kovarê derdixin bitirsîne.

Gel, bi girtina Cemal Özçelik nerazibûna xwe bi gelek hawî nişan da û tavilê serbestbûna wî dixwaze...

Berî ku rojnama me bikeve çapê li Senbolê li ser girtina xwedî û berpirsyarê Medya Güneşî Cemal Özçelik û zordariya li ser kovara civînek masmediya û panelek ji alî xebaikarê kovarê ve hat çekirin. Gelek kes besdarî vê panelê bûn.

## Biyok

te di devê te re were!

Apê Pîro got:

- Ka ji min re kêrekê bînin.

Bavo got:

- Tu dixwazî ci bikî? Sergêjaniyek din ji me re dernexî?

Apê Pîro, bi awakî ji xwe bawer, got:

- Kesê ku dest bi karekî dike helbet tiştekî dizane ku dike. Helbet ezê ji tiştekî bikim.

Amojina Pîrnazê hat, got:

- Tu çakêtê lêwik neçîrînî xwedê nehiştî!

Apê Pîro deng nebir xwe, kér ji destê Dayê girt, bi destenlerizokî kér xist hundi-re bêrikê. Zerayiya biyokê xuya kir. Me hemuyan bi diqqet berê xwe da, lê nihêrt.

Apê Pîro ji nişka ve dev jê berda û bi me de xeyidî got:

- Ma hun nahêlin piçek ronya çirê bê?!

Ü kérê di alîyê biyokê yê xuyakirî re kir. Ji nişka ve kera destê wî şe-mitî, pozê kérê ji çakêt derket der...

- Axxx...

Ev axîn axîna me gişan bû. Kêrê aliyekî çakêt çîrandibû.

Amojinê tepek li serê Apo xist. Apê Pîro sor bû. Biyok derketibû lê ci fêde.

\* \* \*

Em hemû bi halekî hêvîşîkiyayî rûniştibûn. Dayê kartolên kelândî diqeşartin. Pîreka cîranê me, serê xwe di de riye odê re direjî kir, got:

- Tu bi Xwedê kî, çakêtê Esxer çawa bû?

Gava dît ku reng li me nemaye, bêyî ku li hêviya bersîvî bîmîne, çû. Dengê wê di hat, ji mîrê xwe re digot:

- Ez dibêjim qey biyokê sergêjaniyek ji wan re çêkir. Hela tu ji piçekî ji ciyê xwe bilive, here binêre ka ci buye Xwedê jê razî!

Ekber û Esxer li alîkî rûniştibûn kurepist dikirin. Esxer dawîya dawî biyok bi dest xistibû.

- Pist... pist... wiş... biyok...

- B... pist... pist...

Ekber hêdîka digot:

- Bi Xwedê ez dê tenê gezekê lêxim, welle. Tenê gezek.

Deng biliya û ji nişka ve qîjîn bi Esxer ket. Ekber bi biyokê re pê-çîka Esxer ji gez kiribû.

Ji Bavo re mahne derket, rabû her du dan ber hutikan hincika wan derxist.

Wergêrên ji Farisî:  
M.Elî û Malmîsanij

(1) Aşûra: Navê mehellî yê Abşûran e. Abşûran çemekî avgenî ye ku di nav Kermanşah're derbas dibe. Li her du re\_xên çem xanî hene.

(2) Pirraw: Navê çiyayekî li nêzî Kermanşah'ê ye.

(3) binêre: 'Elî Eşref Dervîşyan, Abşûran, Tehran [?], Êntêşaratê Yar Muhemed, çapê heftom 1358/1979, rûpel: 39-51

## Şerê û Iraqê rawestiya lê kuştina Kurdan berdewam e...

Hesen Mizgîn

Li her çar aliyen dinê lihevhatinê bi hêvi cedibin. Li Afrika guftugoyen di navbera Angola, Afrika Başûr, Kuba û DAY, li Amerika Latin plana aşıtye di navbera Nikaragua, Costa Rica, Guatemala, El Salvador û Honduras, li Asyayê têkillyen di navbera Vietnam, Kamboçya, Tayland û muhalefeta Komboçayê de û lihevhatina di navbera Afganistan û Pakistanê de hêviyek nû diden gelên dinê. Lihevhatina navbera Iran û Iraqê ji lihevhatinê jorin bêtir bala gelên dinê kîşand ser xwe. Hemû hêz û dewletên aştixwaz kîfîxwêtya xwe ji vê lihevhatinê re diyar kirin.

Helbet wek gelê Kurd em ji ne li diji vê lihevhatinê ne. Ji ber ku şerê herdu dewletên mêtintgekar li gel zirarek mezin dida gelên her du welatan, li ser ax' a Kurdistanê dibû û bombeyen ku dihatin avêtin gelê me pê dihat kuştin, bi sedan mal wêran dikir. Ma gelo pişti vê lihevhatinê dê ev qetliama ji holê rabe? Bi ya me na, ranabe. Ji ber vê yekê em Kurd ji alikî de ji ji vê lihevhatinê ne kîfîxwêş in.

Hem Iran û hem ji Iraq Pişti rawestandina ser wê bixwazin aboriya xwe rast bikin û berê xwe bidin bazaar çekên modern. Wê her du ali ji di demek kurt de ordiyen xwe bi çekên modern rapêçinin. Ü bi van çekên modern wê berê xwe bidin Kurdistanê. Bila tu kes nebêje ku filan dewlet ji ya din çêtir e. Ji xwe her tim wexta ku fersend ketiye destê dewletên kolonyalist ji her carê zêdetir û hovtir eriş bîriye ser gelê Kurd.

Helbet nuha dê bête gotin; ma parti û rexistinêne me bi van tiştan nîzanin? Bele baş dizanin, lê belê ji ber hin şert û sebeban car din dikevin lepêñ dijmin.

Pişti her trajedeyek wisa, bê şik her Kurdeki welat perwer dibeje, "Hêviya min ev e ku eva ha ji me re bibe dersek." Dêma şerê Iran û Iraq dest pê kir hêviya herkesi ew bû ku gelê Kurd cardin di navberê de ne pelciqe Kurd dest bidin hev, hêzen xwe bikin yek û welatê xwe azad bikin. Lê sed mixabin ev yek nebû. Cardin bi hezaran Kurdên bê súc hatin kuştin. Bi hezaran Kurd bi dare zorê dan koç kirin. İro Iran û Iraq li hev dikin. Gelo bala hemû dinê li ser vê lihevhatinê ye. Wê Kurdên çer bibin û ci bê şerê wan? kuştina pirne xema kesi ye?

## Dîktatorê Pakistanê Ziya Ul-Haq mir

Di 17'ê Tebaxê de dîktatorê Pakistanê Ziya Ul-Haq tevî erkâniherb û hin serbaz û qumandarêne xwe û sefirê DAY'ê yê Pakistanê di ceza belafirê de mirin.

Ziya Ul-Haq di 1977'an de li diji Zulfikar Alî Butto derbeyek leşkerî çekiribû û dûre ji Butto idam kiribû. Ziya Ul-Haq 11 salan Pakistan wek dîktator û bi qanûnê İslâmî idare kir.

Meriv dikare bibêje ku bi miri-

na Ziya Ul-Haq dinya ji dîktatorî din jî xelas bû.

Pişti mirina Ziya Ul-Haq, Xulam İshaq ket şuna wî. Xulam İshaq di civîna masmedîa de da diyarkirin ku hilbijartin wek berê hatîbîlankirin di 16'ê Çiriya Pêşin de bi iştirakkirina partîyan ve bê kirin. Wek tê zanîn Ziya Ul-Haq dixwest hilbijartînê bê partîyan bike.

□

## Fîşê abonetiyê

### Abonetiya salekê

120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx: .....  
Nav û paşnav: .....  
Navnîşan: .....  
.....

Welat: .....

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiyê û fîşê jorîn dagirin li ser adresa jérîn ji me re bişînin.

Adres: P.R S-172 06 Sundbyberg/Sweden

## Pirsa Namîbya ber bi helbûnê diçe



Serekê dewleta Kuba Fidel Castro û serekê dewleta Angola, Jorê Eduardos Santor

Ev demek dirêj e ku di navbera Angola û Afrika Başûr de ji bo lihevhatinê civîn cedibin. Di civîna dawîya meha Tirmehê de ku li Newyorkê pêk hat ji bili Angola û Afrika Başûr, Kuba û DAY ji besdar bûn.

Chester Crocker, wezîrê derve yê duemîn ê DAY pişti civînê eşkere kir, ku li ser hin prensîban lihevhatinek çêbûye. Pîk Botha wezîrê derve yê Afrika Başûr ji di beyana xwe de qala vê lihevhatinê kir.

Lihevhatin tê wê manêku Kuba wê eskerên xwe ji Angola bikşîne û Afrika Başûr ji wê ji Namîbyayê derkeve. Bi vê yekê ji Afrika Başûr, pişti 73 salan bîryara Netewên Yekbûyi ya 435'a, ya li ser serxwebûna Nambîbyayê qebûl dike.

### Bi kurtayî Namîbya

Nufûsa Namîbya nêzî mîlyonekî ye. Namîbyaya pêsi koloniya Almanya Fe-

deral bû. Sala 1915'an Almanya Federal ji Namîbyayê derket. Afrika Başûr ev yek firset dît û Namîbyayê işxal kir. Namîbya ji sala 1915 û vir de di bin destê Afrîka Başûr de ye.

Mezinahiya Namîbyayê 824 975km<sup>2</sup> ye. Ji ali zireet û cotkariyê ve geleki dewlemend e. Namîbya ji ali madenê wek uranyûm, çinko, nikel, ziv, sıfır(bakır) û vanadîum pîr dewlemend e û ji vê yekê ji endustriya dewlemendîya binerd endustriya heri girîng e. Xewdiyê şirketa Gesellschaft Rossing Uranium Afrika Başûr û Almanya Federal e. Ev şirket di aboriya herêmî de rolek mezin dileyize.

SWAPO pêşengîya rizgarîya gelê Namîbyayê dike. Serfiraziya leşkerî ku vê dawiyê SWAPO li diji Afrika Başûr bi dest xist, Afrika Başûr anî masa lihevhatinê. Helbet di vê pêşkettinê de rola heri girîng tê-

koşîna gelê Angola û leşkereñ Kubayê ye.

Lihevhatinê de pirsa Namîbya heri girîng e. Serekê dewleta Angola Jose Eduardos Santos di prenskonferansı xwe de beyan kir ku pirsa Namîbya di mesela lihevhatinê de pirsa heri girîng e û heyâ pirsa Namîbyayê hel nebe tu lihevhatin di navbera Angola û Afrika başûr de çenabe.

### Pêşnîyara lihevhatinê

Ji bo Angola eskerên Kubayê paşde bişîne 4 şert dide pêş:

- Divê Afrika başûr ji erde Angola derkeve.

- Divê bîryara 435'a ya Netewên Yekbûyi bo serxwebûna Namîbyayê bê meşandin û pêk bê.

- Divê alikariya DAY û Afrika Başûr ji UNITA re bête rawestandin.

- Divê Afrika Başûr garanti bide ku carek din êrisê Angolayê neke.

## Li Kamboçayê pêşnîyara aşîtiyê

Di van demen dawî de muxalefeta hukûmeta Kamboçayê ku li Taylandê li diji Kamboçayê ser dike bi hukûmeta Kamboçayê re li ser pêşnîyarekê li hev kirin. Li gor vê pêşnîyarê divê di demek mueyen de 100 000 eskerên Vietnamî ji Kamboçayê derkevin û hêzek leşkerî ya navnetewî ciyê eskerên Vietnamî bigrin. Serekwezîre Kamboçayê Hun Sen li dij vê pêşnîyarê derket û wiha got; eger fraksiyonê Kamboçî û nav hev de li hev nekin hêzek aştûparê nikare rewşê kontrol bike.

Hun Sen di axaftina xwe de beyan kir ku heya sala 1990'i wê eskerên Vietnamî bi temamî Kamboçayê terk bikin.

Muxalefeta Kamboçayê bi serokatiya

Pren Sihanuk pêşnîyarek din pêskêş kir. Di vê pêşnîyarê de ev xalê jérîn hene:

- Pişti ku eskerên Vietnamî ji Kamboçayê derkevin divê hukûmeta Kamboçayê xwe belav bike û di serokatiya Prens Sihanuk de ji 4 partîyan hukûmetekê muwaqtet bête avakirin.

- Ew hukûmeta muwaqtet bila hilbijartîneke nuh pêk bîne, serokê dewletê, aleke nuh û marşike millî hilbijêre.

Serokwezîre Kamboçayê Hun Sen di beyana xwe de got ku wê komîsyonek ji Netewên Yekbûyi û guftugoya aşîtiyê de beşdar bibe. Di konferansa guftugoya aşîtiyê de wê Laos, Vietnam, Tayland û Endonezya ji besdar bibin.